

## Mêjî, raman, ronahî û desthilatdarî

Mêjî robarekî mirêsdar e, navenda sereke ya ramandinê ye. Tarî şev e, kor e, pêşiyê nabîne. Ji bo ku bibîne divê binêre. Nêrîn arastebûna dîtina hawira ku mirov di nav de ye. Mêjî tarî be, hewldan û mecala nêrînê tune be yan jî hatibe tunekirin... *Yaşar Eroglû/R.8*



## Serdema Brejnev

Serdema Leonid Îlyîç Brejnev, dikeve navbera salên 1964 û 1982yan. Di dîroka Yekîtiya Sovyetê de yek ji serdemên herî nakok e. Tevî rexneyên 'ji bo bêçalakbûna aborî, xurtkirina burokrasiyê û tepeserkirina muxalefetê' jî; serdema... *Kurdistan Lezgiyeva/R.6*



## Anatomiya berxwedana cewherî

Arvîn wek şervaneke ji nav dilê gel derketiye, di pêvajoya têkoşînê de fêm dike ku nasnameya kurdî ji qedera nav zêdetir e. Ew dibe 'çekek ji têkoşîna gel'. Ev veguherîn, wê ji 'nasnameya pasîf' ber bi 'nasnameya xwebûnî û şoreşger' ve... *Hogir Berbir/R.11*


*17 - 23 Mijdar 2025*
*Hejmar:* 309
*Buha:* 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

# xwebûn

xwenasîn e


# Armanca TJAyê azadî ye

Aktivîsta TJAyê Hulya Alokmen der barê TJAyê de got: "Bi hezaran salan e jin di nav civakê de hatine çewisandin, tune hatine hesibandin, nehatine dîtin. Li ser jinan her cureyên tundiyê hatiye meşandin. Di qeyraneke wiha de îlankirina TJAyê bû ronahî, îfade û îdiaya azadiya jinên kurd û hemû jinên kurdistanî."




Aktîvîsta TJAyê Hulya Alokmen têkildarê salvegera TJAyê ya 10emîn û xebatên TJAyê axivî û got: "Dema ku em behsa TJAyê dikin têkoşîna bîrdoziya azadiya jinan a salên 90î tê bîra mirov. Her çiqas nav were guhertin jî, lê nasnameya jinan û têkoşîna azadiya jinan naguhere. Bênavber û bêsînor têkoşîna xwe berdewam dikin. Jinan li dijî hemû astengkirin, girtin, kuştin, paşverûyên civakî têkoşîna xwe ya azadiya berdewam kir. Yekemîn bi berxwedêriya xwe bandoreke mezin li civakê kir. Ya duyemîn, bi israra xwe ya guhertin û veguhertina civak ê. Ya sêyemîn, bi xwedîderketin û parastina nirxên civakî. Herwiha bi Rarperîna Jin Jiyan Azadî mînaka vê bandorê ya herî şênber e. Ya çaremîn jî xwedî derketina jinên ku ji aliyê unîformayiyên dewletê ve tên kuştin. Gulistan Doku, Îpek Er, Sakîne Kulter ku li Şirnexê ji aliyê serokê ocaxa MHPê ve hat şewitandin herwiha Narîn Guran û herî dawî jî Rojbîn Kabaîşê bandoreke mezin li civakê kir. Xwedîderketina van jinan bandor li ser malbatên wan jî kir... *Hevpeyvîna Xecê Şen/R.4*

## Komîsyon çima naçe Îmraliyê?

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi gavên erênî yên li ser bangawaziya Birêz Abdullah Ocalan ji hêla Tevgera Azadiya Kurdistanê ve hatine avêtin heta îro hat. Birêz Ocalan di banga 27ê Sibatê de destnîşankiribû ku dê pêvajo bi gavên dualî pêş bike. Tevgera Azadiyê heta niha hemû pêwistiyên pêvajoyê bi cih anîn. Lê Dewetê heta niha ji hin beyanan gotinan tenê li Meclisa bi armanca pêşvebirina pêvajoyê komisyon ava kir. Lê heta niha komîsyonê erka xwe tam nelîstiye. Guhdarkirin bi dawî bûn. Lê aliyê sereke yên pêvajo û meseleya kurd Birêz Ocalan hêj guhdar nekiriye. Tê zanîn ku Birêz Ocalan ji despêka pêvajoyê... *H. Halît Alaçati/R.6*

## Derûnnasiya entegrasyona şervanên azadiyê!

Ezmûna gelek gerîlayan a di warê dîsîplîn, rêxistin û giyanê sivîl di saziyên reformkirî de (hikûmet, şaredarî, alîkariya karesatan û heta ewlehiya ji nû ve profesyonelkirî di bin çavdêriya sivîl de) dikare sûdê bide her kesî. Qebûlkirina giştî ya êşa herdu aliyan û rêûresmên rêzdar ên derbasbûnê dibin alîkar ku rûmeta xwe biparêzin. Rastî û başbûn divê bi hev re werin nirxandin û ravekirina van sedeman, mîna ku statuya qanûnî hewce dike, divê ji ber sedemên psîkolojîk, giyanî û exlaqî neyê paşguhkirin. Ev faktorên girîng in. Çima ev rêya rêzdar pêwîst e? Ji hêla psîkolojîk ve, şerm berxwedanê zêde dike û pergala demarî... *Prof. Dr. Abdulillah Polat/R.8*

## Pêngav bi pêngav

Di van sed û du salan de kurdan bi her awayî li ber xwe da. Berxwedaneke bêhempa li giştiya Kurdistanê bi pêş ket; çi bi şer, çi bi hest û raman, kurd têk neçûn, zindî man û niha gihiştin asta, ku ji tirk, ereb û farisan re bibêjin, «binêre ez heme, wek tava rojê dibiriqim, min bibîne û bipejirîne. Birêz Ocalan jî vê rastiyê di hevdîtina xwe ya dawî de bi vî awayî derdixe pêş û dibêje, ''Divê hebûna kurdan bi hemû aliyên xwe ji aliyê zagona komarê ve were pejirandin.'' Wateya vê: dawîlêanîna polîtîkaya înkarê û pejirandina hebûna kurdan e. Gava komara Tirkiyeyê kurdan wek hebûnekê bipejirîne, ew ê bibe pêngava yekemîn a bidawîlêanîna siyaset û pêkanîna înkar û îmhaya sed û du salan.... *Hesen Huseyîn Denîz/R.7*

## Helwesta li dijî yekîtiya Sûriyeyê

Divê em ji bîr nekin ku Sûriye ji bo Tirkiyeyê girîngiyeke stratejîk a dîrokî heye. Tirkiye dixwaze bibe aktorek sereke di vejandin û pêşeroja Sûriyeyê de, da ku di heman demê de bandora Îran û Rûsyayê kêm bike û bandora xwe li ser siyaseta Sûriyeyê misoger bike. Di çarçoveya vê xwestekê de, kurdan dike hincet û li herêmê hebûna xwe didomîne. Ger derfet bibîne wê êriş jî bike. Ji bo ku bikaribe êriş bike jî pêwîstî bi deshilatek nêzî xwe heye. Di halê heyî de, deshilata Şamê ji bo vê stratejiyê guncav e. Lewma Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyeyê, Hakan Fîdan, gav bi gav Ehmet El-Şera dişopîne. Şera li ku derê be Fîdan jî li wir xuya dibe. Ger gotin li cih be mîna hevkarê deshilata Şamê tevdigre. Di nav van geşedanên dijwar de, kurd li Sûriyeyê divê bi stratejiyeke jêhatî tevbigerin da ku destkeftiyên xwe biparêzin û pêşeroja... *Felemez Ulûg/R.6*

## Li taxên kurdan alozî zêde kirin



Endamê rêveberiya Meclisa Tendirustiyê ya Helebê Dr. Osman Îsa anî ziman ku beriya dorpêça taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, heta 12ê tebaxa 2024an, ji aliyê rejîma Baasê ve dihat birêvebirin û got: "Tax di bin dorpêçek pir dijwar de bû. Lê piştî ruxandina pergala Baasê, ew dorpêç hinekî sist bû. Ketin û derketina taxê ji berê hêsantir bû. Piştî demekê me dît ku komên çete yên girêdayî Tirkiyeyê, li Helebê serweriya xwe zêde kirin. Bi taybetî li dora taxên kurdan ku pergala rêveberiya xweser lê hatiye avakirin û herêma herî bi ewle ye, xwe bi cih kirin. Taxên herî ewle û pak in. Ji ber vê yekê çeteyên girêdayî Tirkiyeyê hêdî hêdî xwe li dora taxan bi cih kirin. Alozî zêde kirin... *R.3*

## Tundiya aborî

Jinên Rojava yên ku di nav projeyên ku ji hêla Komîteya Aborî a Kongra Star ve tên sazkirin, cihê xwe digrin û hewl didin xweserbûna xwe li qada aboriyê bidest bixin. Cudahiya wê jî jinên ku bi komî xwe di projeyên taybet de birêxistin kirine, hewl didin jinan bêhtir nêzî hev bikin, hevgirtinekê çêbikin, da ku bikaribin ji hev re di rojên herî zor de bibin palpişt û hev bi hêz bikin. Têkoşîna li dijî tundiya aborî û bipêşxistina projeyên xweserbûna jinan ên çandiniyê, bazirganî û hwd. ne hêsan e. Li hember hişmendiya baviksalar gotina xwe kirin ne hêsan e û baweriyek zêde dixwaze ku li qada aborî gavên xwe yê pêşîn biavêjin. Hewldan hene ku jin projeyên mezin bi rê ve bibin, kargeh û kampaniyan çêbikin û wiha rê bidin destên kar ên jinên din û derfetên kar ava bikin. Jin dema gav diavêjin dizanin ku gavên çiqas girîng û çarenûsî diavêjin. Erka malbatê ye ku keçên xwe di qada aborî de... *Sorgul Şêxo/R.2*

## Huqûqê hêzan


Tirkîya de zî pergalo kapîtalîst est o. Hêzê huqûqî nê, huqûqê hêzan est o. Qanûnê dewleta tirke manenê "marî", têna înanê ke lingerut ê gaz kenê. Rejîmê hêzan de lingerutan rê ca çin o. Ê raştê her tewr cîyakerîye, serdestîye, zordestîye û zulmî yenê. Mîyanê lingerutanê Tirkîya de elewîyî, kurdî, sosyalîstî û pêro kêmneteweyîyî est ê. Qanûnî têna vera înan yenê xebitnayene. Serdestî û êyê ke serdestanê rê xizmetkarîye kenê, nênê muhakemekerdene. Mîsal nika Tirkîya de yew dozger est o, nameyê (Akin Gurlek) ci zaf "namdar o".*R.9*

### Adar Jiyan

## Zimannasî û zimanê zanînê/**R.10**

# Tundiya aborî ji bo jinan tundûtûjiyek nûjen e

Tundiya aborî ya li dijî jinan rola wan bêbandor dike, beşdariya wan a aborî sînordar dike. Dibe sedema gelek binpêkirinên mafên wan ên kedê. Tundiyek wiha azadiya jinan li mal û cihên kar sînordar dike, tengasiyê zêde dike



Sorgul
Şêxo



Tundiya aborî cureyeke tundûtûjiyê ya nûjen û tevlihev e. Berovajî tundûtûjiya fizîkî, ku şopên fizîkî yên rasterast nahêle û berevajî tundûtûjiya psîkolojîk, ku her gav bi awayên aşkere xuya nake, lê ew li bingeha jiyana kes, serxwebûn, rûmet û mafên wan ên madî dixe. Rasterast bandorê li ser şiyana wan a jiyana birûmet û gihîştina xwefêmkirinê dike. Tundiya aborî behsa kontrola hêza darayî, milk û çavkaniyên aborî yên takekesî, malbatî yan civakê dike ji bo armanca bindestkirin, kontrolkirin an zirardayîna qurbanî. Ew pir caran bi awayê bêparkirina pere yan çavkaniyan, kontrola li ser mûçeyan, redkirina gihîştina kar an perwerdehiyê û cudakariya aborî di nav malbat, sazî yan civakê de digire. Tundûtûjî ji asta takekesî derbas dike û dibe diyardeyek civakî ya kûr ku bandorê li aramiya malbat û civakan dike.

**Şopên kûr dihêlin**

Tundiya aborî ya li dijî jinan rola wan bêbandor dike, beşdariya wan a aborî sînordar dike. Dibe sedema gelek binpêkirinên mafên wan ên kedê. Tundiyek wiha azadiya jinan di mal û cihên kar de sînordar dike, tengasiyê zêde dike û rûberên ewlehiyê û aramiyê kêmtir dike.

Tundiyên fizîkî, derûnî, aborî, devkî û zayendî li ser jinan bi salan şopên xwe yên kûr dihêlin, wan birîndar dikin û her di hişê wan de dimînin. Ev zextek derûnî çêdike û pêre bandorê li têkiliyên wê yên civakî malbatî û hevjîniyê jî dike. Jiyan ji bo jinên ku bûne qurbaniya tundiya aborî û di nav kêmderfetiyan de hewla peydakirina pencereyeke jiyanê didin, zortir e.

Bifikirin ku jin di jiyana xwe ya hevjîniyê de bi ewqas tundiyê re rû bi rû dimîne. Lê ji ber ku di warê aborî de ne azad e neçar dimîne wê tundiyê qebûl bike û li hember wê bêdeng bimîne. Jinên ku îro ji jiyana xwe ya hevjîniyê nerazî ne û nikarin biryara berdanê bidin, hêleke wê vedigere nexweserbûna wê ya aborî. Ji ber ku jinên ku koletî pejirand nebûn xwedî pîşe, nikarin ji bin siya mêr jî derkevin û gotina xwe bêjin.

Heta niha rêjeya hebûna jinan di qada bazirganiyê de pir kêm e û bi tiliyan tê jimartin, tevî ku di ser şoreşê re 14 sal derbas bûne. Hejmara jinan di bazara kar de pir kêm û lawaz e. Jinan xwe xistiye cihekî wiha ku ji ber şerma ji mêr û civaka mêrsalar, nikare biryaran li ser jiyana xwe bistîne û dereng dimîne. Gava wê ya derengmayî wê di hin aliyan de dide poşmankirin.

**Rê dirêj e**

Ji ber ku jin nikarin bikevin nav kar, ji xwe re çavkaniyên debarê ava dikin. Jin karê ku dayik û dapîrên wan kirine heta niha didomînin. Mînak, li kêlekên malên xwe bi çêkirina tenûran û firotina wan re eleqedar dibin. Ew jî li kêleka malên xwe çêdikin û wiha dibe çavkaniya debarê, di demeke ku mêr çavkaniyên aborî sînordar dike. Bi rêjeyeke pir bilind bav bi keçên xwe re nabin alîkar ku bibin xwedî pîşeyek ku siberojê pêre bibe alîkar ku destê xwe li ber kesekî din venekin. Bi hewldanên kesane hin jin bûn xwedî pîşe; mîna endezyarî, bijîşkî, hesinkarî û hwd. Lê di malan de hîn jin bi tundiya aborî re rû bi rû dimînin, ev rastiyek e ku mirov nikare paşguh bike û bêje Şoreşa Jinan biserketî ye. Hîn rê dirêj e û rêwiyên şoreşê bê rawestan di nav têkoşîneke bêhempa de ne.

**Jin çima ne xwedî pîşe ne!**

Hin malbat ji ber ku nikarin zarokên xwe xwedî bikin, neçar dimînin wan bi zaroktî bizewicînin. Ev jî aliyek tundiya aborî û krîza wê ye ku di nav rewşên şeran de derdikeve holê. Hin keç ji ber aboriya kêm ya malbatê nikarin bixwînin û xwe nas bikin. Wiha jî li hember civaka baviksalar nikarin biryaran li ser jiyana xwe werbigirin. Çima her jin wekî her mêrekî ne xwedî pîşe ye? Ji ber jinan dispêrin mêran û dibêjin dawiya her jinekê mala hevjînê wê ye, çima wê bibe xwedî pîşe û wê çi bike! Bi van gotinan jinan dixapînin û wê bê palpişt û piştgirî dihêlin. Her wiha jin ji mîrasê tê bêparkirin, ev jî cureyeke tundiyê ye.

Jin di nav Şoreşa Rojava de, hewl didin li nav projeyên aborî cih bigrin û bibin xwedî rol. Avakirina aboriya komunal û kolektîf armanca her kooperatîfekê ye. Lê belê eger em bêjin ku gihîştiye asta ku di nav Şoreşa Jinan de şoreşek aborî pêk aniye, wê ne rast be. Hewldan didomin û têkoşîna jinan ranewestiyaye.

**Gavên jinan**

Jinên Rojava yên ku di nav projeyên ku ji hêla Komîteya Aborî a Kongra Star ve tên sazkirin, cihê xwe digrin û hewl didin xweserbûna xwe li qada aboriyê bidest bixin. Cudahiya wê jî jinên ku bi komî xwe di projeyên taybet de birêxistin kirine, hewl didin jinan bêhtir nêzî hev bikin, hevgirtinekê çêbikin, da ku bikaribin ji hev re di rojên herî zor de bibin palpişt û hev bi hêz bikin. Têkoşîna li dijî tundiya aborî û bipêşxistina projeyên xweserbûna jinan ên çandiniyê, bazirganî û hwd. ne hêsan e. Li hember hişmendiya baviksalar gotina xwe kirin ne hêsan e û baweriyek zêde dixwaze ku li qada aborî gavên xwe yê pêşîn biavêjin.

Hewldan hene ku jin projeyên mezin bi rê ve bibin, kargeh û kampanyan çêbikin û wiha rê bidin destên kar ên jinên din û derfetên kar ava bikin. Jin dema gav diavêjin dizanin ku gavên çiqas girîng û çarenûsî diavêjin.

**Xwendin tenê têr nake!**

Erka malbatê ye ku keçên xwe di qada aborî de destek bikin û keçan wekî kurên xwe bibînin. Eger kurên xwe fêrî pîşeyekê dikin, divê ji bîr nekin ku xwendin tenê têra keçên wan nake, pêwîst e wan jî bikin xwedî pîşe. Di gelek deman de keç ji ber nikare biçe bajaran, xwendina wê nîvcû dimîne û di mal de dest li ber rûyan li benda hatina zavayekî ye, an jî ji bêkariyê dikeve depresyonê û bi nexweşiyên derûnî re rû bi rû dimîne. Bendemayîn mirov diwestîne. Her çiqas hin malbat dewlemend bin jî, dîsa keçên wan bi tundiya aborî re rû bi rû dimînin.

**Pîşe û xwendin hev temam dikin**

Ya ku tê xwestin her keçek li kêleka xwendina xwe bibe xwedî pîşe, pîşe û xwendin hev temam dikin û jiyanek baştirîn ji jinên xwedî armanc re dabîn bibe. Ji biçûkanî hêviyên wiha di keçên xwe de biçînin, kar ne şerm e û hebûna jinan li bazarên kar li cem jinên din rehetî û aramiyê ava dike.

Serdil Akdag

# Bingeha tundiyê ji ku tê?

Tundûtûjî ne tenê kiryarek fizîkî, ew mekanîzmayek serdestiya derûnî, hestyarî û avahîsaziyê ye jî. Hemû cureyên zext, zordarî û paşguhkirina azadiya mirovan, binpêkirina rûmet û mafê jiyanê di nav pênaseya tundûtûjiyê de cih digirin. Li gor dîtina rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan, tundûtûjî bi dîroka şaristaniya serdest a mêran dest pê dike. Nemaze di avakirina civakî ya hiyerarşîk de ku bi hilweşîna nirxên matriarkal/dayiksalar ên civakê, di serdema neolîtîkê de dest pê kiriye. Ev pirsgirêka heyî ne tenê pirsgirêkek navkesane; ev pirsgirêk pirsgirêkek kûr a civakî ye, ku bi têkiliyên dewlet, desthilatdarî û îstismarê ve xwe kûrtir kiriye.

Tundîtûjî ne hestek mirovî ye. Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan jî di nêrînên xwe de dibe ku tundûtûjî bi avakirina desthilatdariyê dest pê dike. Ev desthildatdarî jî bi xistina jinan re tê avakirin. Şikestina yekemîn û ya herî bingehîn a avakirina vê desthilatdariya jî bi koletiya jinan dest pê dike. 'Pîrozdîtina jinan a di koletiyê de' ango înkarkirina rola wan di hilberîna civakî de û sînordarkirina wan tenê bi qada hilberîna cinsî û biyolojîk ve, forma yekem û ya herî bingehîn a tundûtûjiyê ye.

Dewlet wekî sazûmankirina civakî û yasayî ya vê serdestiya baviksalar, ango wekî hêza tundûtûjiyê ya rêxistinkirî tê damezrandin. Tundûtûjiya ku li dijî jinan di nav civakê de belav dibe, dibe çavkaniya sereke ya şer, îstismar û pevçûnê.

Tundûtûjiya ku tê kirin bi rêbazên cur bi cur pêk tên. Êrişa fizîkî ku herî zêde tê zanîn rasterast li ser laş pêk tê. Di vê cureya tundiyê de jin tên birîndarkirin û kuştin. Tecawiz, tacîza cinsî û îstismara ku li ser laşê jinan pêk tê cureya tûndûtûjiyê ya cinsî ye.

Heqaret, gef, zext û qelskirina îradeyê di nav cureya tundûtûjiya derûnî de pêk tê. Vê cureya tundûtûjiyê herî zêde di nav malan de ji aliyê mêran ve li ser jinan pêk tê. Dîsa mêr bi rêya tundûtûjiya aborî jinan mehkûmê xwe dikin û tundiyê li wan dikin.



Tundûtûjî bi van rêbazan tên kirin. Lê astengiya herî mezin a li dijî guherîna vê hişmediya tundûtûj nêrîna li dijî jinan e ku rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan divê di têkoşîna jinan de zêdetir li ser guherîna vê hişmendiyê bê sekinandin. Vê hişmediya heyî ya ku rê li ber tundiyê vedike û di nav hemû civakê de belav bûye hem mêran û hem jî jinan mehkûmê xwe kiriye. Ji ber vê yekê ye ku rêber Ocalan dibêje, 'Bê jin jiyan ne pêkan e lê bi jina heyî re jî nayê jiyîn'. Lewma di têkoşîna xwe ya heyî de divê jin destpêkê xwe ji zîncîrên xwe yên koledariyê rizgar bikin.

Jinên kurd ji bo xwe û civakê ji vê tundiyê rizgar bikin bi salan e di nav têkoşînê de ye. Têkoşîna ku jinên kurd didin bi dirûşma Jin Jiyan Azadî xwe gihand hemû cihanê. Ev têkoşîna ku ji aliyê jinên kurd ve di bin sîwana Jineolojî û Şoreşa Rojava de tê bipêşxistin, nîşan dide ku derbaskirina tundiyê tenê bi guhertina qanûnan ne pêkan e. Ji bo vê guherînê paradîgmayek nû pêwîst e. Rêber Ocalan dibêje ku ev hewldan divê li dijî pergala serdest be.

Armanca sereke ya vê têkoşînê ne tenê jiholêrakirina tundiyê ye. Ev têkoşîn hewl dide hişmendiya jin û mêrên azad li ser bingeha exlaq û siyaseta hevpar ava bike.

# Nexweşxane dorpêçkirî ne

Ji 25ê îlona 2025an ve ye komên girêdayî Tirkiyeyê û hikumeta demkî ya Sûriyeyê taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê dorpêç kirine. Rêveberê Meclisa Tenduristiyê ya Helebê Dr. Osman Îsa anî ziman ku dorpêça li ser taxan, bandoreke xerab li xizmeta tenduristiyê û nexweşan dike û gelek nexweşan ji tunebûna derfetan jiyana xwe ji dest daye

Sosin Gulo




10ê adara 2025an, di navbera Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) û hikûmeta demkî ya Sûriyeyê de peymanek hat îmzekirin. 1ê nîsanê jî di navbera Meclisa Giştî ya taxên Şêx Meqsûd-Eşrefiyê û nûnerên hikûmeta demkî ya li Helebê de peymana ji 14 xalan pêk tê, hatibû îmzekirin. Piştî peymanê hikûmeta demkî 77 caran peyman binpê kir. Herî dawî, 25ê îlonê, komên girêdayî Tirkiyeyê û hikûmeta demkî, taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dorpêç kirin. Şêniyên van taxan û nûnerên saziyên civakî yên navneteweyî li dijî dorpêçê û ambargoyê bertekên xwe anîn ziman. Rêxistinên navneteweyî destnîşan kir ku jin, zarok û mezinên taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ji ber qutbûna xwarin, derman, av û ceyranê zehmetiyan dijîn û nexweş nikarin bên dermankirin.

Endamê rêveberiya Meclisa Tendiruistiyê ya Helebê Dr. Osman Îsa anî ziman ku beriya dorpêça taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, heta 12ê tebaxa 2024an, ji aliyê rejîma Baasê ve dihat birêvebirin û got: "Tax di bin dorpêçek pir dijwar de bû. Lê piştî ruxandina pergala Baasê, ew dorpêç hinekî sist bû. Ketin û derketina taxê ji berê hêsantir bû. Piştî demekê me dît ku komên çete yên girêdayî Tirkiyeyê, li Helebê serweriya xwe zêde kirin. Bi taybetî li dora taxên kurdan ku pergala rêveberiya xweser lê hatiye avakirin û herêma herî bi ewle ye, xwe bi cih kirin."

Dr. Osman Îsa, diyar kir ku taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi nasnameyên kurd tên naskirin û got: "Taxên herî ewle û pak in. Ji ber vê yekê çeteyên girêdayî Tirkiyeyê hêdî hêdî xwe li dora taxan bi cih kirin. Alozî zêde kirin. Di ketin û derketina taxan de metirsî zêde kirin. Beriya şerê 10ê cotmehê ketina gelek pêdiviyên jiyanê yên wekî arvan, sotemenî û derman, xwarin, şîrê zarokan qedexe bû. Ji ber van qedexeyan jiyana li taxê ket bin xetereyê."

Dr. Osman Îsa anî ziman ku piştî şerê 6ê cotmehê dorpêça taxê bêhtir bû wiha axivî: "Heta niha jî dorpêç didome. Gel dibe hedefa êrîşên çeteyan. Ji dema tax hatine dorpêçkirin heta niha, hin mirovên nexweş jiyana xwe ji dest dan. Piştî dorpêçê tûpên oksîjenê yên ku vala bûn, em nikarin tijî bikin. Ji ber tunebûna oksîjenê gelek kesên nexweş jiyana xwe ji dest dan. Ji ber derfetên kêm ên nexweşxaneyê, nexweşên ku lazim bû biçûna nexweşxaneyên bajêr, nekaribûn biçin. Ji ber nikaribûn biçûna, jiyan xwe ji dest dan."

**Derfet gelek kêm in**

Dr. Osman Îsa bal kişand ser kêmbûna derfetên nexweşxaneyan û wiha lê zêde kir: "Ji derveyî Nexweşxaneya Şehîd Xalit Fecir ku wekî nexweşxaneya gel tê naskirin, çar nexweşxaneyên taybet jî li taxan hene. Xwediyên wan jî kurd in. Lê derfetên wan jî sînordar in. Tiştên ku li nexweşxaneya gel nedihatin dîtin li wir hebûn. Lê tiştên ku li wir jî nedihatin dîtin, ji ber dorpêçê nedikarîbûn biçin nexweşxaneyên bajêr. Amûrên emeliyata mejî li gel me tune ne. Derziyên zarokan tune ne. Gelek amûr tune ne. Kêmasiya amûran gelek e. Derfetên ji bo dermankirinê gelek kêm in."

Dr. Osman Îsa her wiha bal kişand ser bandora diyalogan a li ser dorpêçê û wiha bi dawî kir: "Di rojên dawî de hêdî hêdî dorpêça li dora taxan sist dibe. Pirsgirêka Şêx Meqsûd û Eşrefiyê girêdayî pirsgirêka hebûna statuya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye. Çiqas diyaloga Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi Şamê re bi pêş bikeve, ew qas derfet zêde dibin. Dijberî wê dema ku têkilî aloz jî dibin vê carê bi awayê neyînî bandorê dike. Ji ber vê yekê xebatên giştî yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, li hebûna gelê kurd a giştî û gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bandorê dike."

# 'Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk rêya rizgariyê ye'

Lîlav Elî




Di salên dirêj ên aloziya Sûriyeyê de, gelê kurd ê li rojavayê Kurdistanê li hember hemû siyasetên binpêkirin, qirkirin, zilm û dagirkeriya ku ji aliyê rêjîma Esed a rûxiyayî û dewleta tirk ve dihatin meşandin, karîbûn li ber xwe bidin, hebûna xwe îsbat bikin û destkeftiyên mezin bi dest bixin.

Bi ketina rêjîma Esed re hêviya gelê Sûriyeyê, nexasim gelê kurd, ew bû ku êdî dawî li vê zilm û zordariya dihat kirin, were. Lê bi hatina hikûmeta nû ya Sûriyeyê re hêviyên gel şikestin û polîtîkayên rêjîmê yên înkarkirin û binpêkirina mafên pêkhateyan dewam kir. Îro kurdên li rojavayê Kurdistanê ji bo avakirina Sûriyeke nenavendî, pirreng û demokratîk, li ser maseyên diyalogan pêşengiyê dikin. Nenavendîbûn, li hember pergala yekparêz û yekalî altarnatîfeke zêrîn e. Nenavendbûn tê wateya pirrengiyê û xurtkirina pergala bihevrejiyanê. Nenavendbûn welatan xurt dike û rê dide pêkhateyan ku bixwe bikaribin xwe bi rê ve bibin û çarenûsa xwe diyar bikin.

Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk a TEV-DEMê Remziya Mihemed ya li rojavayê Kurdistanê, der barê rewşa Sûriyeyê û girîngiya pergala nenavendî ji rojnameya Xwebûnê re axivî.

Remziya Mihemed di destpêka axaftina xwe de destnîşan kir ku hikûmeta nû ya Sûriyeyê bi kiryar û hişmendiya xwe ya cîhadîst aloziya 15 salan dirêjtir kir û rê li ber şerekî navxweyî vekir û got: "Gelên Sûriyeyê piştî ketina rêjîma Esed bi hêvî bûn ku dawî li siyasetên qirkirin, kuştin, revandin û înkarkirinê were, lê belê hikûmeta nû ya Sûriyeyê bi kiryar û hişmendiya xwe ya cîhadîst aloziya 15 salan dirêjtir kir û rê li ber şerekî navxweyî vekir. Berovajî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ku aramî û ewlehî tê de serwer e û her pêkhateyek bi çand, nasname, reng û baweriya xwe dijî, li herêmên din ên Sûriyeyê yên di bin serweriya hikûmetê de ev yek pêk nehat. Ev herêm bûn cihê talankirin, revandina xelk û jinan, kuştina welatiyan û cihê tesfiyekirina hesaban. Ji lewra em her tim tekez dikin ku eger hikûmeta nû dixwaze êşên sûriyeyiyan bi dawî bike divê nimûneya li herêmên Rêberiya Xweser (Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê) ji xwe re esas bigire. Nimûneya li herêmên Rêveberiya Xweser mozayîka hevgirtina gelan, xweseriya jin û ciwanan e."

**'Nenavendîbûn şertekî bingehîn e'**

Remziya Mihemed bal kişand ser girîngiya avakirina sîstemeke nenavendî ji bo Sûriyeyê û ev tişt anî ziman: "Pirrengiya pêkhateyan a di hundirê Sûriyeyê de pêwîstî bi sîstemeke nenavendî dibîne. Sûriye êdî nikare weke salên destpêkê bi yek al, yek ziman û yek olê dewam bike. Bi avakirina sîstema nenavendî re mafê hemû gelên li gund û bajaran dijîn tê parastin û vîna gel derdikeve holê. Gel bi îradeya xwe dikare kesên wan bi rê ve bibe û daxwazên wan pêk bîne hilbijêre. Her wiha her pêkhateyek dikare bi awayekî azad çanda xwe bi pêkhateya din bide naskirin, pirrengiya heyî tê parastin û jiyaneke wekhev tê avakirin. Êdî gel dê xwe berpirsyar bibîne û erkên li ser milê xwe yên ji bo dabînkirina edalet, demokrasî û aştiyê pêk bîne. Ji ber vê yekê sîstema nenavendî ji bo Sûriyeyê şertekî bingehîn e."

**'Hikûmet me temsîl nake'**

Remziya Mihemed têkildarî paşguhkirina rol û têkoşîna jinan a ji aliyê hikûmeta HTŞê ve jî wiha got: "Li rojavayê Kurdistanê bi Şoreşa 19ê Tîrmehê re ku wekî şoreşa jinan têkoşîn û berxwedana wê hat naskirin, jinan di hemû qadên jiyanê de wekî qada siyasî, aborî, çandî, rêveberî, dîplomasî û parastinê de pêşengtî kir. Jinan artêşa xwe Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) ava kir û li hember dagirkerî û êrişên terorî yên DAIŞê parastina ax, destkeftî û şoreşa xwe kir. Jinan ji bo Şoreşa Rojava û pergala Rêveberiya Xweser bi cîhanê bidin naskirin têkoşîneke mezin meşand û bi dehan jinan jî canê xwe di oxira vê de da. Eger mirov li rewşa jinan a piştî hatina hikûmeta nû ya Sûriyeyê binêre, dibîne ku yên herî zêde hatine paşguhkirin û têkoşîna wan nayê dîtin jin in. Di avakirina saziyên hikûmetê de, ta bi nivîsandina destûra Sûriyeyê paşguhkirina rol û hebûna jinan berbiçav bû. Dîsa tundî, kuştin û revandina jinên peravê û Swêdayê hişmendiya hikûmetê ya li hember jin û nasnameya wê derket holê. Ji lewra heta ku vîna jin û civakê esas neyê girtin ev hikûmet dê me temsîl neke."

**'Rêya rizgariyê'**

Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk a TEV-DEMê Remziya Mihemed teqez kir ku Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo Sûriyeyê û jinan rêya rizgariyê ye û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Rêxistinbûna jinên kurd li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo jinên ereb, tirkmen, ermen û suryan bû tecrûbeyek, rêxistinbûna jinan hişt ku pêkhate jî rêxistina xwe di saziyên Rêveberiya Xweser de mezintir bikin û xweserbûna jinan hat misogerkirin.

Ji lewra beşdarbûna jinên kurd di hikûmeta nû ya Sûriyeyê de girîng e da ku Sûriyeyê ji krîza heyî rizgar bibe û derî li pêşerojek nû vebibe divê jinên kurd cihê xwe di birêvebirina welat de bigirin. Jinên peravê, Swêda, Şam, Îdlib û Derayê dikarin sûdê ji tecrûbeya têkoşînê ya jinên kurd bigirin û ji bo nivîsandina destûreke xweser rol bilîzin. Di heman demê de, ji bo avakirina Sûriyeya ku gelê wê hêvî dikir, ji bo pêşerojeke nû û demokratîk divê jinên sûriyeyî Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk a Rêber Abdullah Ocalan bikin stûna jiyana xwe. Felsefeya rêber Apo ji bo parastina nirxên tevahî gelan, ji bo yekîtî û wekheviyê ye. Bi vê felsefeyê em dikarin dawî li şer, krîz û qeyranan bînin û bi hev re li welatekî aram bijîn. Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk rêya rizgarî û aştiyê ye."

## 'Em ê Kurdî-Zan a Araratê bikin navenda zanînê'

Navenda Nûçeyan

Saziyên ku kurd ji bo bipêşxistina çand û ziman ava dikin, ji aliyê dewletê ve bi hincetên cuda tên girtin. Ev girtin nahêlin ku sazî werin avakirin. Yek ji bajarê ku bi salan e saziya çand û zimanê kurdî lê nehatiye vekirin jî Agirî ye.

Piştî 10 salên bê saziya çand û ziman, 8ê mijdarê, li Agiriyê bi navê Komeleya Çand Huner û Ziman a Kurdî-Zan a Ararat hat vekirin.

Em der barê avakirina Komeleya Çand Huner û Ziman a Kurdî-Zan a Ararat de bi yek ji mamosteyên komeleyê Servet Ararat re axivîn.

Servet Ararat di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser vekirina Komeleya Çand Huner û Ziman a Kurdî-Zan a Ararat û wiha got: " Vekirina komeleyeke bi vî rengî xeyala min a bi salan bû. Sala 2004an dema min li medresê bi zimanê erebî perwerde didît, di wê demê de gotinên Şêx Ehmedê Xanî li ser min bandor dikirin. Ehmedê Xanî, di Nûbihara Biçûkan de wiha digot; ''Umûda me ji tifalan ne ji emelbetalan (hêviya me zarok û ciwan in, êdî kal û pîr nikarin bixwînin û têbikoşin)."

Servet Ararat di berdewama axaftina xwe de ev tişt anî ziman: "Armanca me ew e ku em Komeleya Çand Huner û Ziman a Kurdî-Zan a Ararat li Agiriyê bikin navenda zanînê. Ji bo vê jî destpêkê em ê giraniya xwe bidin ser fêrkirina zimanê kurdî. Heta niha ji bo fêrbûna ziman 30 qursiyeran serlêdan kiriye. Em ê pêşîn bi zaravayê kurmancî dest pê bikin û di asta yekem, duyem û sêyem de ziman fêr bikin. Demek şûnde em ê asta mamostetiyê jî saz bikin."

Servet Ararat herî dawî li ser xebatên xwe yên pêşerojê got: "Em ê li kêleka perwerdeya ziman, perwerdeya tembûr, wênesazî û voleybolê jî bidin."

Servet Ararat bang li agiriyan kir da ku tevlî xebatên çand û zimanê kurdî bibin.

## TJA BÛ ÎFADE Û ÎDIAYA KU DÊ JIN Û MÊR BI HEV RE AZAD BIBIN

# Îdiaya azadiya jinan e

■ Xecê Şen

*Tevgera jinên kurd, piştî ku bi biryarnameya KHKê KJA hat girtin û şûn de, Tevgera Jinên Azad (TJA), 20ê mijdara 2016an, bi şîara 'Em Li Dijî Darbeyan Têkoşîna Xwe Bi Rêxistin Dikin' li Amedê konferansa xwe pêk anî û ava kir. TJAyê gelek xebatên hêja yên wek pêngava 'Em Xwe Diparêzin', 'Bi Jin Jiyan Azadiyê Ber Bi Azadîyê Ve' dan meşandin. Herwiha ji bo guhertin û veguhertina hişmendiya mêrane, ji bo civakeke azad û demokratîk li ser esasê pîvana civaka ehlaqî û polîtîk gelek pêngavên girîng bi pêşxistin û xebat meşandin.*

*Aktîvîsta TJAyê Hulya Alokmen bi boneya salvegera TJAyê ya 10emîn pirsên me bersivandin.*



Aktîvîsta TJAyê Hulya Alokmen têkildarê 25ê Mijdarê, salvegera TJAyê ya 10emîn û xebatên TJAyê yên 10 salên dawî axivî û got: "Îlankirin û rêxistbûna TJAyê, bû ronahî, îfade û îdiaya azadiya jinên kurdistanî, jinên Rojhilata Navîn û hemû jinên cîhanê."

**20 mijdarê salvegera damezrandina TJAyê ya 10emîn e. Hûn xebatên TJAyê yên 10 salan çawa dinirxînin?**

Ji bo ku xwebûnê ev firset da me gelekî spas dikim. Divê di serî de em behsa dîroka têkoşîna jinên kurd bikin. Têkoşîna azadiya jinên kurd ên qada siyasî û civakî ji salên 90î dest pê dike. Heta îro didome. Salên 90î gelek kovar û komele hatin avakirin. Sala 2005an DOKH û sala 2015 jî Kongreya Jinên Azad KJA hat avakirin. Di 2016an de ji ber alozî û polîkayên dewletê yên wê pêvajoyê KJA hat mohirkirin û girtin. Gelek aktîvîstên KJA û TJAyê hatin kuştin, avêtin zindanan û sirgûnên derveyî welat kirin, xebatên wê qedexekirin û xwestin ku TJAyê krîmalîze bikin. Qeyûm gelek saziyên jinan, malên perwerdehî û kargehên şaredariya ku di bin navê KJAyê de bûn girtin. Li şûna jinan, mêr wek qeyûm hatin tayin kirin. Girtina KJAyê, ji bo me ti carî nebû asteng. Li pêşiya têkoşîna jinan û rêxistina me nebû asteng. Berovajiyê wê, jinan têkoşîn di asta jor de bi pêş xist. Jinên kurd ku hêza xwe ji dîroka xwe girtiye, gotin ku ew ê têkoşîna û rêxistinbûna xwe bidomînin. Jinên kurd piştî girtina KJAyê jî bi hemû pêkhateyên xwe, 20ê mijdara 2016an, bi şiara "Em Li Dijî Darbeyan Têkoşîna Xwe Bi Rêxistin Dikin" li Amedê konferansek pêk anî û Tevgera Jinên Azad (TJA) îlan kir. Îlana TJAyê gelekî li zora dewletê çû. Bi hezaran salan e jinên ku li civakê hatine çewisandin, tune hatine hesibandin, ji aliyê hişmendiya mêrsalarî ve nexwestiye bê dîtin, li ser jinan her cureyên tundî, tacîz û tecawiz hatiye meşandin û di tarîtiyê de mane. Tam jî di qeyraneke wiha de îlankirina TJAyê bû ronahî, îfade û îdiaya azadiya jinên kurd û hemû jinên kurdistanî.

***TJA bi kîjan armancê ava bû û çi hedef danî pêşiya xwe?***

Ev pirseke girîng e. TJA îdiaya azadiya jinan e. Armanca wê ew ku jinên ku bi hezaran sal in di pergala mêran a zayenperest de di tarîtiyê de hatine hiştin, birêxistin û perwerde bike. Mijarên me yên ku em li ser disekinin ev in: li nav civakê û li her kêliya jiyanê xwe îfadekirin, tundî û her cureyên tundiya li ser jinan, polîtîkayên şerê taybet ku ji aliyê dewletê û unîformayiyên dewletê ve tên meşandin, rêbazên têkoşîna li dijî polîtîkayên şerê taybet û rê û rêbazên têkbirina van polîtîkayan, zayenda civakî, bîrdoziya azadiya jinan, jineolojî û hwd. Di gelek hêlan de perwerdekirina jinan armanca TJAyê ya sereke ye. Ev perwerdehî dibe ku hinek caran bi rêya atolyeyan bên kirin, hinek caran bi rêya rêzeçalakiyên hunerî, çand û zimanî bên kirin. Ango TJA dibêje ku perwerdekirin û birêxistibûna şert e. Jin çiqas xwe birêxistin bikin, ewqas dikarin xwe biparêzin. Xweparastin bi xweperwerdekirin û xwerêxistinkirinê pêkan e. TJA îdiaya azadiya jinên kurd û kurdistanî, Rojhilata Navîn û ya hemû jinan e.

***TJAyê kîjan xebatên dîplomatîk kirin û bandoreke çawa li ser jinên cîhanê kir? Hûn dikarin hinekî qala van xebatan bikin?***

TJA tenê xebatê li nav jinên kurd nameşîne. Divê mirov tenê wek tevgereke jinên kurd lê nenêre. TJA îfade û îdiaya hemû jinên kurdistanî, yên ereb, suryan, ermen, tirk û hwd ye. TJA hawar û awaza hemû jinên bindest e ku dilê wan ji bo azadiyê dilîline. Me wek TJAyê bi vê baweriyê xebatên xwe di serî de li Kurdistanê, li Tirkiye, Rojhilata Navîn û hemû cîhanê meşandin. Di dema DOKHê de me, 2010, konferansa Yekîtiya Jinên Kurd li Amedê ava kir. Me koordînasyonek saz kir û bi vê koordînasyonê dem bi dem xebatên Yekîtiya Jinên Kurd û xebatên Kongreya Neteweyî ya Kurdan kirin. Dîsa sala 2017an, li Amedê konferansa Yekemîn a Yekîtiya Jinên Kurd ên Bakur pêk anî û konferansa 2emîn jî me îsal careke din li Amedê li dar xist. Dîsa me îsal konferansa Yekîtiya Parlamenterên Jin ên Kurd, li Amedê pêk anî. Konferansa Yekîtiya Jinên Kurd a Neteweyî îsal civîna xwe ya navberê jî li Silêmaniyê li dar xist. Em niha jî amadekariya Konferansa Yekîtiya Jinên Kurd a Neteweyî dikin ku dê li Başur pêk bê. Em di heman demê de jî di delegasyona NADAyê de cih digirin. Em tevlî konferansên Jinên Rojhilata Navîn dibin. Em di meşa jinên cîhanê de cih digirin ku 5 salan carekê ji welatekî cîhanê dest pê dike û welat bi welat digerên û em tevlî gelek xebat û konferansên wan jî dibin. Me heta niha bi jinên cîhanê re gelek xebat kirine û konferans pêk anîn.

***Hûn binçavkirin û girtina aktîvîstên TJAyê bi çi ve girêdidin. TJAê li dijî van doz û êrîşan helwesteke çawa nîşan da?***

Dixwazim li ser kurtedîroka TJAyê çend tiştan bêjim. Sala 2016an ku aloziyên qeyûman dest pê kir, her çiqas bi sedan sazî û dezgehên jinan hatibin mohrkirin jî, di pêvajoyeke wisa de îlankirina TJAyê pir girîng e. TJAyê rêxistina xwe ji her alî ve û li hemû bajarên Kurdistan û Tirkiyeyê berfireh kir. Li dijî tundiya li ser jinan kampanyayên girîng kirin. TJAyê bi rêya kampanyayan hem jin perwerde kirin, û hem jî rêxsitina xwe mezin kir. Xebata îlankirina TJAyê pir li zora dewletê çû. Divê mirov vê rastiyê bibîne. Wezareta dadê TJA hedef nîşan da û êrîşên li ser TJAyê û aktîvîstên wê her roj zêde kir. Piştî gotina wezaretê dadê, her roj kom bi kom jin hatin binçavkirin û girtin. Serdozgerê Amedê û rayedarên dewletê ji xwe re kiribûn wezîfe ku her roj jinên kurd bişînin zindanê. Di serî de Leyla Guven, Semra Guzel, Ayla Akat, berdevka demê ya TJAyê Ayşe Gokkan û bi sedan aktîvîstên TJAyê hatin binçavkirin û girtin. Ayşe Gokkan û hemû aktîvîstên TJAyê ji ber xebatên xwe tên darizandin. Mînak li gel ku doza Ayşe Gokkan hatiye xerakirin jî dîsa nayê berdan. Ev nîşaneya nijadperestî û zayendperestiya dewleta mêrane ya li dijî jinên kurd û dostên wan e. Lê TJA têkoşîna xwe didomîne. Li gelek bajaran atolyeyên pewerdehiyê saz kirin. Konferans li dar xistin. TJAyê berî her tiştî têkbirina polîtîkayên tecrîda giran a li ser rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan kir rojeva xwe. Azadiya fizîkî esas girt. Heta birêz Ocalan azad nebe, çareseriya demokratîk çênabe. Ji kampanyayan bigire heta rêzeçalakiyên 8 adarê, 25ê mijdarê û gelek konferansan azadiya fizîkî ya birêz Ocalan kir rojeva xwe ya sereke.

***TJAyê bandoreke çawa li jinan û civakê kir? Di civakê de guhertin û veguhertineke çawa kir?***

Dema ku em behsa TJAyê dikin têkoşîna bîrdoziya azadiya jinan a salên 90î tê bîra mirov. Her çiqas nav were guhertin jî, lê nasnameya jinan û têkoşîna azadiya jinan naguhere. Bênavber û bêsînor têkoşîna xwe berdewam kirin û dikin. Jinan li dijî hemû astengkirin, girtin, kuştin, paşverûyên civakî têkoşîna xwe ya azadiya berdewam kir û wan got, 'Em Hene û Em Li Vir in'.

Ya ewil Jinan bi berxwedêriya xwe bandoreke mezin li li civakê kir. Ya duyemîn, bi israra xwe ya guhertin û veguhertina civak ê. Ya sêyemîn, bi xwedîderketin û parastina nirxên civakî. Herwiha bi Rarperîna Jin Jiyan Azadî mînaka vê bandorê ya herî şênber e.

Ya 4emîn jî xwedî derketina TJAyê jinên ji aliyê unîformayiyên dewletê ve yên polîtîkayên şerê taybet didin meşandin û her roj jinan qetil dikin: yên weke Gulistan Doku, Îpek Er, Sakîne Kulter ku li Şirnexê ji aliyê serokê ocaxa MHPê ve hat şewitandin, her wiha Narîn Guran û herî dawî jî Rojbîn Kabaîşê bandoreke mezin li civakê kir. Xwedîderketina van jinan li ser malbatên wan jî bandorekî mezin kir.

***Polîtîkayên şerê taybet tên çi wateyê û hûn çawa şîrove dikin?***

Demeke dirêj e, polîtîkayên şerê taybet li ser jinên ciwan û hemû jinan tên meşandin. Em dizanin ku kî ne xwediyên van polîtîkayên şerê taybet. Gelek jinên ciwan û zarokên ku hatine kuştin û me nebihîstine jî hene. Qirkirina xwezayê jî encama polîtîkayên şerê taybet e. Divê em li dijî polîtîkayên şerê taybet çi bikin? Destpêkê divê em xwe bigihînin jinên ciwan. Ji ber ku têkoşîna jinan tiştek e wisa ye ku tu nikarî bibêjî em gihîştine astekê. Têkoşîna jinan wek rûbarekê her tim diherike ji nifşekê derbasî nifşeke nû dibe. Bi qasî ku bedel hatine dayîn û berxwedanên mezin hatine nîşandan û şoreşên jinan pêk hatine jî lê hê jî li civakê nêrîna jinan nehatiye kabulkirin. Jineke bihemle keçekê bîne, ev dibe sedema bêmoraltiyê li nav malbatê. Hê jî dibêjin 'xwedê kurekî bide te yan jî xwedê kurê te bihêle'. Civak bi hişmendiyeke mêrsalar û bi polîtîkayên desthilatdariyê hatin avakirin. Lê ev nayê wê watê ku dê wisa jî berdewam bike. Em ê li dijî vê hişmendiyê têbikoşin û xwe azad bikin.

***Di xebatên 10 salan ên TJAyê de tiştên herî balkêş çi bûn?***

Me ji bo jinan gelek atolyeyên perwerdehiyê li dar xistin. Ev atolyeyên pêkhatî li bîrdoziya rizgariya azadiya jinan, zayenda civakî, hevjiyana azad, jineolojî, pergala konfederalîzma demokratîk û komuna jinan, li ser felsefe û peymana civakî bûn. Em di civîn, konferans, komxebatan de bi jinan re civiyan. Ji bo guhertineke mayinde pêwîst e jin û mêr bi hev re perwerde bibin û bi hev re azad bibin. Heta ku jin azad nebe, mêr jî azad nabe û civak jî azad nabe. Azadiya mêran û azadiya civakê bi heqîqeta azadiya jinan ve girêdayî ye. Ji bo pêkanîna vê azadiyê jî pêwîst e pêşîn mêr hişmendiya xwe biguherîne.

Êdî li dijî tundiya li ser jinan û qetilkirina jinan mêr tevlî çalakiyên TJAyê dibin. Li hinek bajaran jî tenê mêr dimeşên çalakiyan li dar dixin û dibêjin, 'Em ji nasnameya mêr û qatilbûna mêran fedî dikin" û bertekên xwe yên tund nîşanî mêrên kujer didin. Ev cihê şanaziyê ye. Ev jî encama perspektîfa rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan e. Li ser wê yekê encam jî tê wergirtin.

***TJA, di vê pêvajoya aştî û çareseriya demokratîk de risteke çawa dilîze?***

Me ji bo bipêşxistinê gelek xebat, çalakî, komxebat li dar xistin. Herî dawî em ji Amedê heta Enqereyê 7 rojan meşiyan. Aktîvîstên TJAyê bajar bi bajar bi jinan re nîqaşên aştî û çareseriya demokratîk kirin. TJA bi vê armancê kete rê û heta Enqereyê meşiya. Li meclisa Tirkiyeyê li ser navê TJAyê axaftin hatin kirin. Bal kişandin ser têkoşîna jinên kurd û rola wan a ji bo aştî û civaka demokratîk. Li ser meseleya navborî me dosyayek amade kir.

***We behsa dosyayê kir, hûn dikarin hinekî behsa navroka vê dosyayê bikin?***

Naveroka dosyayê bi pêşeroya aştî û çareseriya demokratîk ve girêdayî bû. Xala yekemîn divê mafê hêviyê pêk were rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan, bi awayekî fizîkî azad bibe. Divê mercên wî biguherin û bi hêsanî dikaribe xebatan bike. Divê komîsyon rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan muxatab bigire û pê re hevdîtinê bike û nêrîn û fikrên jinan bên wergirtin ku jin bikaribin rola xwe bilîzin.


***Lijneya Jinan a Rêverberiyên Xwecihî, 5 bajar wekî bajarên jinan îlan kirin. Armanca îlankirina van bajarên jinan çi ye?***

Eger bajarên ku jin lê dijîn ne pêşketî bin û ji nêrîn û fikrên jinan re girtî bin, wê dîsa jin li paş bimînin. Eger bajarên ku tu lê dijiyî, tu xwe bi ewle hîs nekî, tu nikarî wek jinekê li wî bajarî bijiyî. Eger di hemû qadên jiyanê de xwe di ewlehiyê de nebînî û li wî bajarî nikaribî bi awayekî azad bijiyî, ev pirsgirêkeke mezin e. Wê demê mirov nikare behsa mafê azadî û wekheviyê jî bike.

Bajarên dost ên jinan, wek proje li Viyana û Barselonayê hene. Bi niyet û fikra jinan bajar hatine avakirin. Ev pir girîng e. Dema Ayşe Gokhan şaredara Nisêbînê bû, 2009, Nisêbîn wek bajarekî jinan hat îlankirin. Mebesta îlankirina van bajaran jî ev e ku êdî jin li wan bajaran bibin xwedî îrade û xwedî biryar û vîna jinan derkeve holê. Jinwar a ku li Rojava hatiye avakirin, mînaka vê projeyê ya herî şênber e. Em ê bi felsefeya Jin Jiyan Azadiyê, bi fikir û nêrîna jina azad, civaka azad bi komunên demokratîk ava bikin.

***Herî dawî banga we ya ji bo jinan çi ye?***


Me 3yê mijdarê, ji bo 25ê Mijdarê bi dirûşma 'Bi Civaka Demokratîk Ber bi Jiyana Azad a Bê Tundî ve' deklerasyon da û rêzeçalakiyên xwe ji raya giştî re aşkere kir. Em ê li seranserê Kurdistan û Tirkiyeyê, bi jinên kurdistanî û bi jinên Tirkiyeyê re gelek atolyeyên perwerdehiyê li dar bixin û gelek çalakiyên cihêreng pêk bînin. Em bang li hemû jinan dikin ku tevlî meşa azadiyê bibin.



Adar Jiyan

# Zimannasî û zimanê zanînê

**Em ê hewl bidin ku di vê gotarê de li bersiva pirsa "Ziman zanistê çawa çalaktir dike?" , "Xweza çawa wekî zimanê zanînê tê sembolîzekirin?" û "Rola zimannasiyê di vê pêvajoyê de çi ye?" bigerin**



Mirov di hewldana xwe ya ji bo famkirina cîhana hebûnê, zimanê xwe wekî amûra pêwendiyê ya herî karîger bi kar aniye/tîne. Belê wekî ku em her car dubare dikin; ziman tenê ne amûrekî ragihandinê ye; di heman demê de bingeh û çavkaniya hişmendî, raman û zanînê ye. Mirov bi zimanê xwe hem cîhana xwe ya hundirîn û hem jî rastiya xwe ya derveyî ava dike. Lewra hizirîna li ser zimên, hizirîna hebûna mirov bixwe ye.

Di vê gotarê de armanca me ya sereke ew e ku em têkiliya navbera zimannasî û zimanê zanînê di çarçoveyeke felsefî û zanistî de vekolin. Em ê li bersiva pirsa "Ziman zanistê çawa çalaktir dike?" , "Xweza çawa wekî zimanê zanînê tê sembolîzekirin?" û "Rola zimannasiyê di vê pêvajoyê de çi ye?" bigerin.

Cih û cewhera zimên a di hişmendiya mirov de pêk tê pir girîng e. Ziman taybetmendiya herî cihêreng a mirovan e. Ajal dikarin deng û nîşanan derxin, belê tenê mirov dikare deng û nîşanan watedar bike. Wekî ku gelek zimanzan jî pênase dikin, "Ziman di navbera nîşanker (wêneyê deng) û nîşankirî (têgihê) de têkiliyeke çawaniyê ye". Ev çawanî pêwîst dike ku ziman li ser bingeha lihevkirina civakî be. Civakên cîhanê jî bi rêya ziman (gotin û peyvan) ji hev vediqetin; li gor zimanê xwe wateyan diyar dikin û wan li bîreke hevpar dadigerînin. Di vî warî de, ziman tenê nûnertiya cîhana mirov a derveyî nake her wiha şêweyeke ramanê jî diyar dike. Her ziman ji bo têgihîştina cîhanê pêk bîne, di hundirê xwe de rêyekê dibîne. Ji ber ku avahiya ziman sînorên ramanê jî diyar dike, rastiyek epîstemolojîk e (zanyariya zanînê). Lewra zimanê zanînê, biserûberkirina zimanê xwezayî ye jî.

Zimannasî zanistek e ku ziman wekî "pergalek xwezayî" dibîne û wê wekî tevahiyek qaîdeyan bi rê ve dibe. Ji ber vê yekê, rêbaza zimannasî gelek dişibe zanyariyên xwezayî yên wekî çavdêrî, dabeşkirin, dahûrandin û giştîkirinê. Bîrdoza rêzimana veguherîner û çêker a Noam Chomsky ye. Ev bîrdoz di nîvê sedsala 20an de bi pêş ketiye ku aliyekî nasnameyî tevlî zimannasiyê kiriye. Li gor Chomsky, "ziman şiyana hişê mirov e". Vê perspektîfê (bergehê), zimannasî ji diyardeyeke civakî ya xwerû veguherandiye lêkolîneke zanistî ya avahiya hişê mirov. Di vî warî de, zimannasî bi derûnnasî, tûrenasî (norolojî), mirovnasî (antropolojî) û zanista nasnameyî re têkildar e. Cewhera zanistî ya zimannasiyê di nêzîkatiya wê ya raveker de ye. Zimannasî, zimanekî ne perspektîfa "divê çawa be?" perspektîfa "çawa tê bikaranîn?" vedikole. Ev yek jî bi nêzîkatiya giştî ya zanistê re li hev dike. Zanist rastiyê vedibêje, ne ku wê didarizîne. Ji ber vê yekê, zimannasî dîsîplînek e ku ruhê epîstemolojiyê (zanyariya zanînê) temsîl dike.


Zimanê zanistê, ji camidiyê (objektîfiyê) ber bi wateyê ve diçe. Zimanê zanistê, di her dem û serdemê (seranserê dîrokê) de bi pêş ketiye. Di serdemên berê de, xweza bi rêya vegotinên mîtolojîk dihat ravekirin. Di wan vegotinan de, ziman peywireke sembolîk (dawerî) û hestyarî dida ser xwe. Belê bi zanista nûjen re avahiya ziman jî guheriye; ji metaforê (xazeyş) ber bi bîrkariyê (matematîkê) ve guherînek çêbûye. Wekî ku Galileo dibêje, "Xweza bi zimanê matematîkê hatiye nivîsandin." Ev gotin/peyitandin bûye sedema têgihîştinekê ku zimanê zanistê divê razber, gerdûnî û camidî (objektîf) be. Belê, zimanê zanistê bi tevahî ne bêlayen e. Peyv, dawer, remz, nîşan û têgihên zanistî jî berhemên ziman in û bi tevahî ji çarçoveya çandî ya ku wateyê dide zanînê, venaqetin. Bo nimûne, têgihên wekî "vejen (enerjî)", "daring (made)", "kuantum", an "hişmendî" ne tenê peyvên bîrkarî (matematîkî) ne; her wiha nîşaneyên wateyeke kûr a felsefî û zimannasiyê ne. Ji ber vê yekê, zimanê zanistê, tevî angaştên xwe yên gerdûnîbûnê jî, ji cîhana wateya mirov ne dûr e.

Têkiliyeke sêalî di navbera ziman, raman û zanistê de heye. Çerxek heye ku tê de ziman ramanê dişêwîne û raman jî ziman diguherîne. Zanist hêza rêxistinkirinê ya vê çerxê ye. Zanyar, çavdêriyên xwe bi rêya ziman diafirînin û hîpotezên (feraziyeyên) xwe bi saya hêza razberiya zimên ava dikin. Zimanê ku di vê pêvajoyê de tê bikaranîn ne tenê amûrek derbirînê ye; her wiha amûrê hilberîna ramanê ye jî. Li gor bîrdoza "şoreşên zanistî" ya Thomas Kuhn, her paradîgmaya (nimûneya) zanistî, li gor xwe zimanekî diafirîne. Fizîka Newtonî, fizîka kuantumê, teoriya pêşveçûnê, an lêkolînên jîrayiya çêkirî hemû bi termînolojiya xwe, gerdûna xwe ya wateyê diafirînin. Ev jî nîşan dide ka ziman çawa sînorên zanistê diyar dike. Dema ku têgihek nû çêdibe, rêyek nû ya ramanê derdikeve holê. Wekî mînak, têgiha "kêşehêza erdê" ne tenê navê diyardeyekê (xuyanekekê) dide, ew rêyek nû ya ravekirina gerdûnê jî pêşkêş dike.

Têkiliya navbera felsefeya zanistê û zimannasiyê pir girîng e. Zimannasî bi felsefeyê re xwezaya zanistê dinirxîne û di nav têkiliyeke berdewam de ye. Hilketina felsefeya analîtîk (dahûranî) di destpêka sedsala 20an de têgihîştineke din li ziman zêde kiriye. Têgihîştina bingehîn a ku di vê serdemê de derketiye holê ev bû: rastiya zanistî xwe dispêre rastiya zimên. Ger têgihek xelet were pênasekirin, teoriya (bîrdoza) zanistî ya li ser wê têgihê jî xelet e. Ji ber vê yekê, zelalbûna zanistî rasterê girêdayî zelabûna zimanî ye. Lewra zimannasî tenê ne dîsîplîneke dahûrandina ziman e; her wiha ewlehiya epîstemolojiyê (zanina zanistê) jî misoger dike. Îro, ziman êdî ne tenê berhema hişê mirovan e; ew bûye amûrek aqilê dîjîtal jî. Zekaya sûnî, pergalên pêvajoya zimanê xwezayî û modelên mezin ên zimanî, zimanê mirovan vediguherînin avahiyek bîrkarî. Vê veguherînê aliyek nû li zimanê zanistê zêde kiriye. Ziman êdî ne tenê mijara zanistê ye; ew bûye amûr û nûnerê wê jî.

Ev pêşketin sînorên navbera zimannasî û zanîna hişî bi awayekî çalak ji holê rakiriye. Bingehên avahî û semantîk ên ziman ji hêla pergalên komputerê ve tên fêrkirin û hilberandin. Belê ev yek pirseke girîng a felsefî derdixe holê, "Ma makîneyek dikare bi rastî wateyê fam bike, an jî tiştên xweş û nexweş bihisîne?" Ev pirs nîqaşa li ser sînorên zanîna zimên ji nû ve geş dike. Wate ne tenê avahiyek fermî ye; ew hişmendî, niyet û çarçoveyeke mirovî ye ku pêdiviya hemû mirovên cîhanê pê heye. Lewra zimannasî neynika zanistê ye. Zimannasî şertê hewldana têgihîştina herî bingehîn e ku hebûna zanistê pêkan dike. Zanîn bêyî ziman nikare hebûna xwe bidomîne. Lewra her ceribandin û çavdêrî bi rêya ziman wateyê dibîne. Zimannasî tenê ne zanîna ziman e; ew dîsîplînek e ku zanistê bixwe nîşan dide. Têgihîştina sînorên ziman, têgihîştina sînorên zanistê ye. Her têgihek nû, wateya hebûnê berfirehtir dike; her peyvek nû qadek nû ya zanînê ava dike.

Têkiliya navbera zimannasî û zimanê zanînê du aliyên cuda yên têgihîştina hişmendiya mirov ên bingehîn in. Yek (zimannasî) wateyê vediçirîne ya din (zimanê zanînê) jî wateyê biserûber dike. Dema ku ev herdu dibin yek, rêwîtiya mirovahiyê ya têgihîştina cîhanê dest pê dike. Ango rastiya veşarî ya ku di asta herî kûr a hemû zanyariyan de ye jî ev e: Zanîn, ew têkiliya çarenîn e ku ziman bi gerdûnê re ava dike; zimannasî, ew hêmana jêneger e ku guh dide wê zanînê.



Delav
Feratê Dengizî

# Birînên me

Îro roja Kobanî ye.

Roja rûgermî, dilgermî û serbilindiyê ye. Gazinc li me nayên, temam bindest bi gazinc in, lê me ev serdem derbas kiriye.

Lê em birîndar in, carinan serkeftin û azadî jî birînan nakewînin. Ku em bi kûrahî dîroka xwe, çand, ziman û hebûna xwe didin ber hev, divê rewşa me ne ev bûna. Rabirdû û îroya me li hev nakin, dahatû şolî ye. Divê îro em ne bindest û ne xwedî ewqas birîn bûna!

**Îcar sedem çi ye?**

Mirov dikare têxe rêzê; erdnîgarî, bawerî, civaknasiya qels, nebûna stratejiyeke neteweyî, derengmayîna ji serdem û dîrokê, nebûna yekîtiya gelparêz a neteweyî… her yek li gorî xwe dibe ku rast bê dîtin. Lê ev me têr nake. Çima evqas bindestî, ji jiyanek azad dûrketin; me hindik xwîn neda, me hindik can neda, me hindik serî hilneda, em êşên xwe têxin rêzê, bikin lod, ji çiyayê Agirî dibihure!

**Îcar ev çi hal e?**

Herî dema lihevhatî ya serdema serê sedsala 20mîn a salên 1920/1930î fersendeke dîrokî, çandî, civakî û rêxistinî bû, lê me jê sûd wernegirt. Bakur, rojhilat û başûr serî hildan lê ji hev bêxeber bûn û bi kêmanî yekî ji wan hawara xwe digihand mêtingeran. Belê ragihandin, têkilîdayîn qels bû. Lê xwestek û berxwedana azadiyê qet kêm nebû. Mirov dikare salên 1990-1995an jî wek salên nêzîkî serkeftinê bibîne; lê nebûna yekîtî, qelsiyên navxweyî û nexasim bi destên mêtingeran erîşên Hizbul-Qontra yên ku bûn sedema parçebûna navxweyî dil li me êşand… Lê karwanê azadiyê dimeşiya; li gel bi hezaran can, giyan û birînan, nexasim birînên civakî…



**Îcar Kobanî heye**

Nîşana serkeftin û azadiyê, nîşana lehengiyê, nexasim lehengiya jinên zagrosî, hurî, mitaniyî, jinên hemdembûna medan ên siwariyên dîrokheybetîn… Zerî, hurî û milyaketên, ferîşteyên çiyê! Bi ya min sedema mezin yekîtî ye! Em kurd pir çavnebar, dexes û hovê tovê xwe ne, biyaniyên hebûna xwe û heyranê biyaniyan; "dehwedaro di ber xelkê de!" Lê va piştî berxwedana hemdemî me ev rizand û yekîtiyê serî da. Divê Kobanî wek yekîtiya kurd, wek Kongreya yekitiya Neteweyî ya kurd û Kurdistanê bê dîtin, bê ravekirin û wek destûra makezagona kurdan a bingehîn têkeve rojevê û jiyanî bibe! Ma ne dengê giravê dibêje; "Yek bin û xwe birêxistin bikin. Nexasim rêxistiniya xwecihî…"

Me tola bi hezaran salan, li gel gelek êş, birîn û berdêlan hilda. Êdî derman yekîtî ye, yekîtî nebe aştî û demokrasî jî nabe, yekîtî ji navxweyî, yekîtî ji Kobanî….

Bila risteçemek diyariya dilê we û dermanê birînên me be; dermanê birînên sedsalîn!

**Tî**

*Şîq ji serê min dernayê*
*ji serê min dernayê îro*
*ev êş ji ku hat gelo*
*êşa çiyê*
*ya xapandinê*
*ya bexîliyê*
*ya firotinê*
*ya baweriya jidil*
*yan jî ya jiyana tev sosretî*
*bi tevn*
*bi dekûdolab*
*ya xiyanet wek sonda hebûnê*

*ka sirûda serxwebûnê*
*bi ku ve çû xeyalxwezên*
*zarokî/zarokîn*
*îro serê min têşe*
*ev cezeyê pakiyê*
*zarokiya xwe naxwazim*
*ciwaniyê jî*
*azadî û evînê dixwazim*
*ji dil*
*bila awirên te dilbaz bin*
*dilêş bin*
*jan bin*
*dilhez bin*
*şîq di serê min de*
*dilê min têşe*

*ez aveke tî me!*
*bendavek tî!*

*tişrîn!*

û îro sewdaliyê çavên reş û agirê azadiyê me, bila birîn, birînên me bikewin…

# Komîsyon çima naçe Îmraliyê?

Ku di demek kin de komîsyon neçe li Birêz Ocalan guhdar neke, ev tê wateya ku îktîdar bi destê xwe zirarê dide pêvajoyê. Ku hêj îktîdar nehatibe asta komîsyonê bişîne Îmraliyê hingê niyeta wê ya azadkirina Ocalan nîne

H. Halît Alaçatî

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi gavên erênî yên li ser bangawaziya Birêz Abdullah Ocalan ji hêla Tevgera Azadiya Kurdistanê ve hatine avêtin heta îro hat. Birêz Ocalan di Bangawaziya 27ê Sibatê de destnîşankiribû ku dê pêvajo bi gavên dualî pêş bike. Tevgera Azadiya Kurdistanê heta niha hemû pêwistiyên pêvajoyê bi cih anîn.

Lê Dewetê heta niha ji hin beyanan gotinan tenê li Meclisa bi armanca pêşvebirina pêvajoyê komisyon ava kir. Lê heta niha komîsyonê erka xwe tam nelîstiye. Ligel sazî û radeyarên dewletê gelek derdor guhdar kir. Guhdarkirin bi dawî bûn. Lê aliyê sereke yên pêvajo û meseleya kurd Birêz Ocalan hêj guhdar nekiriye. Tê zanîn ku Birêz Ocalan ji despêka pêvajoyê heta niha destnîşan dike ku divê komîsyon wî guhdar bike. Heyeta dewletê ya bi Ocalan re hevdîtinan dimeşîne jî ev yek qebûl kir. Li gorî danûstandinan diviya zûde Birêz Ocalan guhdar bikira. Lê her carê bi hicetekê ev hevdîtin hate taloqkirin.

Îktîdar car caran li ser çapemeniya xwe hewil dide vê rewşê normal nişan bide û hincetên nû peyda bike. Heta beşek çapemeniya îktîdarê wekî Yenî Şefaqê li dijî çûyîna Komîsyonê derdikeve. Tê zanîn ku tu îradeya vê çapemeniyê nîne ku bêyî destûra îktîdarê nûçeyek ji rêzê jî biweşîne. Xuya ye ku ev nûçe ji hela îktîdarê ve tên weşandin.

Ku çapemeniya îktîdarê ya li dijî çûyîna komîsyonê ya Îmraliyê derdikeve bi destûra îktîdarê nehatibin weşandin hingê di nava îktîdarê de dubendiyek dijwar heye. Li gorî hind çîrokan ev şerê îktîdarê yê piştî Erdogan e. Lê mijara me ne ev e. Çapemeniya îktîdarê ya em dizanin û dibinin ne mimkûn e bêyî îktîdarê van nûçeyan bimeşîne.

Ji ber ku di paşperdeyê de rayedarên îktîdarê sedema taloqkirina çûyîna Komîsyonê ya Îmraliyê wekî helwesta CHPê nişan dide. Çapemeniya îktîdarê ya li dijî çûyîna komîsyonê derdikeve jî heman hincetê tîne ziman. Ev nîşan dide ku sedema taloqkirina çûyîna Komîsyonê îktîdar bixwe ye û van nûçeyan jî ew dide weşandin.

Rastî ne ew e ku komîsyon naçe Îmralîyê. Îktîdar komîsyonê naşîne Îmraliyê. Wekî sedem jî CHPê nîşan dide. Ji serê pêvajoyê heta niha îktîdar CHPê wekî sedema gelek gavên divê biavêje lê heta niha neavêtine nîşan dide. Zelal bûye ku îktîdar vê rewşê wekî stratejiyekê bikar tîne. Ev stratejî çiye?

Ji ber ku li pêşiya gav avêtina îktîdarê ne tu astengiyên hundirîn ne jî derveyî nemane. Lê îktîdar ji bo gav neavêje hincetan peyda dike. Van hincetan jî bi deste xwe diafirîne. Operasyonên bi destê darazê li hemberî CHPê tên meşandin jî bi vê armancê tên kirin. Formûl pir hêsan e. Operasyonan li dijî CHPê pêk bîne. CHP bila li dijî operasyonan hêrs bibe û bi vî awayî di asta dijberiya pêvajoyê de bigire. Piştre jî sedema gav neavêtinê CHP nîşan bide.

Rast e helwesta CHP di gotinê de nebe jî di piratîkê de xizmeta pêvajoyê nake. Bi taybetî çapemeniya Kemalîst dijminiya Birêz Ocalan, Tevgera Azadiyê û gelê kurd dike. Lê îktîdar jî ji bo CHP û bi giştî Kemalîstan di vê pozîsyonê de bigire her tiştî dike. Li aliyekê CHPê di asta dijberiya pêvajoyê de digire û li aliyê din CHP wekî hinceta neavêtina gavan nîşan dike. Ev lîstikek pir pespaye û bêexlaqî ye. Lê divê bê zanîn ku ev lîstikên îktîdarê tên dîtin. Birêz Ocalan jî Tevgera Azadiyê jî û gelê kurd jî di ferqa vê lîstikê de ne.



Ku di demek kin de komîsyon neçe Îmraliyê û li Birêz Ocalan guhdar neke, ev tê wateya ku îktîdar bi destê xwe zirarê dide pêvajoyê. Pêvajo tenê bi azadiya Birêz Ocalan pêkan e. Ku hêj îktîdar nehatibe asta komîsyonê bişîne Îmraliyê hingê niyeta wê ya azadkirina Ocalan nîne. Ku îktîdar û dewlet samîmî be divê demildest komîsyonê bişîne Îmraliyê.

Pêwist e CHP jî di ferqa lîstikê de be. Divê CHP jî aşkera bike ku li dijî çûyîna Komîsyonê ya Îmraliyê û mafên gelê kurd nîne. Nexwe dê gunehbarê pêvajoyê bibe CHP. Ji bo berjewendiyên vê erdnîgariyê berpirsyarî dikeve ser milê herkes û her derdorê. Divê herkes berpirsyariya xwe bi cih bîne.



Kurdistan Lezgiyeva

## Di dema Brejnev de 'Serdema Zêrîn'

Serdema Leonid Îlyîç Brejnev, dikeve navbera salên 1964 û 1982yan. Di dîroka Yekîtiya Sovyetê de yek ji serdemên herî nakok e. Tevî rexneyên 'ji bo bêçalakbûna aborî, xurtkirina burokrasiyê û tepeserkirina muxalefetê' jî; serdema Brejnev bi başbûnên girîng di jiyana welatiyên Sovyetê de cih girt. Di van salan de gelek kesan aramî, baweriya bi pêşerojê û başbûna rewşa madî bi dest xistin, ku ev yek dihêle em aliyên erênî yên vê serdemê binirxînin.

Yek ji destkeftiyên sereke yên serdema Brejnev mezinbûna aboriyê bû. Ev bi rêya bikaranîna çalak a çavkaniyên xwezayî, bi taybetî petrol û gazê, pêk hat. Zêdebûna dahatên îxracatê rê da hikumeta Sovyetê ku asta jiyanê bi girîngî baştir bike. Mûçeyên karmendan, her wiha teqawid û feydeyên aborî jî zêde bûn. Avakirina xaniyan bi pîvanek mezin dest pê kir. Vê yekê rê da ku bi milyonan malbat bibin xwedî apartman.

Serokatiya Brejnev girîngiyeke mezin da qada civakî. Tora saziyên bijîşkî, sanatoryûm û malên bêhnvedanê, ku dermankirina belaş ji bo karkeran peyda dikirin, hatin berfirehkirin. Sîstema perwerdehiyê hat bipêşxistin. Bi vê yekê pergala perwerdehiya belaş a di hemû astan de, ji dibistana seretayî bigire heta perwerdehiya bilind, ava kir. Gelek kesan ji malbatên karker û gundiyan derfet dîtin ku perwerdehiya bilind bistînin û kariyerên serketî bi dest bixin. Vê pergala piştgiriya civakî hestek aramî û baweriyê bi pêşerojê re afirand. Ev jî bo mirovên ku şer û wêraniya piştî şer jiyane girîng bû.

Tevî şerê sar û pêşbirka çekan, serokatiya Brejnev siyasetek nermkirinê dimeşand. Armanca wê pêşîgirtina li şerê nukleerî bû. Peymanên girîng ên sînordarkirina çekên stratejîk bi Dewletên Yekbûyî re hatin girêdan. Vê yekê jî gefa pevçûnên cîhanî kêm kir. Xurtkirina parastinên welêt ewlehî û parastina ji gefên derveyî misoger kir. Gelê Sovyetê xwe wek welatiyên hêzek mezin hîs dikir. Vê hişt ku dikaribin berjewendiyên wê biparêzin û alîkariya welatên din bikin. Serbilindiya bi welatê xwe; di şekildana raya giştî ya erênî de, bû sedem ku destkeftiyên di zanist, feza, çand û werzîşê de bibin faktorên girîng. Asîmanên aram li jor, baweriya bi ewlehî û aramiyê destkeftiyên girîng ên serdema Brejnev bûn.

Tevî kontrola îdeolojîk, serdema Brejnev bi geşbûneke çandî ya diyarkirî ve hat misogerkirin. Sînema, wêje, muzîk û şano geş bûn. Fîlmên neteweyî hatin çêkirin, şano hatin pêşkêşkirin û pirtûk hatin nivîsandin. Ne tenê li Yekîtiya Sovyetê, li derveyî welêt jî cîhê xwe wergirtin. Gelek hunermend, nivîskar û zanyarên Sovyetê derfet dîtin ku rêwîtiyê li derveyî welêt bikin û beşdarî festîval û konferansên navneteweyî bibin. Vê asoyên wan fireh kirin û danûstandina çandî hêsan kir. Pêşketina geştiyariyê derfetên welatiyên Sovyetê jî berfireh kirin. Rêyên geştiyariyê hem li welêt û hem jî li derveyî welêt hatin vekirin. Vê yekê rê da welatiyên Sovyetê ku çand û welatên din bibînin. Di encamê de, tevî hemû kêmasî û nakokiyên serdema Leonid Brejnev, nayê înkarkirin ku di van salan de gelek gelên Sovyetê rewşa wan a madî baştir bû. Aramiya civakî û baweriya wan bi pêşerojê çêbû. Mezinbûna aborî, garantiyên civakî, fikara ji bo xebatkarên civakê, xurtkirina parastinê û geşbûna çandî hemîyan hestek guhertinek erênî di jiyana welatiyên Sovyetê de afirandin. Her çend rexneyên li ser serdema bêçalaktiyê hîn jî derbasdar in, hêjayî bîranîna aliyên erênî ye ku jiyana gelên Sovyetê rehettir û ewletir kirin.



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Helwesta li dijî yekîtiya Sûriyeyê

Serokkomarê hikûmeta Şamê ya demkî Ehmed El-Şera, 10ê mijdarê 2025an, li Qesra Spî bi Serokê DYAyê Donald Trump re hevdîtinek kir. Gelek derdor îdia dikin ku bi vê hevdîtinê re wê hevsengiyên li herêmê bên guhertin.

Hat ragihandin ku di hevdîtinê de, Trump û Şera li ser bipêşxistina têkiliyên dualî, rakirina cezayên weke Qanûna Sezar, mijarên aborî û têkoşîna li dijî DAIŞê gotûbêj kiriye. Piştî hevdîtinê Amerîkayê yekser cezayên berfireh ji bo 180 rojan rawestandin û Sûriye tev li koalîsyona navneteweyî ya li dijî DAIŞê kir. Lezbûna van pêşketinan diyar dike ku beriya vê hevdîtinê li ser mijarên sereke li hev kirine. Li ser veberhênanên paşerojê yên DYAyê li Sûriyeyê û rakirina temamî ya ambargoyan ku ji bo vejandin û îstiqrara Sûriyeyê pêwîst in, axaftin hatin kirin. Amerîkayê ragihand ku ew ê destûrê bide Sûriyeyê ku dîsa balyozxaneya xwe li Washington DC vebike.

Di vê hevdîtinê de diyar dibe ku armanca sereke ya Şera ew e ku piştgiriya navneteweyî ji bo hikûmeta xwe zêde bike. Bi temamî ambargoyan rabike û hêza xwe li hundir zêdetir bike. Beşdarbûna Sûriyeyê li koalîsyona li dijî DAIŞê, bi armanca kêmkirina girîngiya hêzên HSDê di şerê li dijî terorê de, wekî gaveke stratejîk ji bo xwe dibîne.

Hevdîtina Trump-Şera nîşan dide ku Sûriye, piştî hilweşandina rejîma Esed, dîsa di qada dîplomasiya navneteweyî de ji xwe re ji nû ve cih çêdike. Bêguman ev yek ne tenê ji bo kurdan ji bo hemû pêkhateyên li Sûriyeyê rîsk û fersendan dihewîne.

Hevdîtin û axaftinên li ser entegrasyona HSDê li nav artêşa Sûriyeyê, bêyî naskirina statuya Rêveberiya Xweser çiqas watedar e? Hin alî HSD û Rêveberiya Xweser ji hev cuda dibînin. Bi taybetî îradeya herêma Bakur û Rohilatê Sûriyeyê tenê weke meseleyek leşkerî tê nirxandin. Ev bi serê xwe şaşîtiyek mezin e. Divê neyê jibîrkirin ku artêşa ku bi navê HSDê tê pênasekirin, ji vê pêkhateyê tê. Ger îro behsa entegrasyona HSDê tê kirin, divê li ser beşdariya Rêveberiya Xweser a nava pergala rêveberiya Sûriyeyê jî were sekinandin.

Hewldana li Qesra Spî ji bo entegrasyona HSDê ya li nav artêşa Sûriyeyê, dibe ku fersendek be ku mafên bebhatiyên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di destûra nû ya Sûriyeyê de bi awayekî fermî bên naskirin û parastin. Lê ya girîng ew e ku Rêveberiya Xweser vê pêvajoyê bi awayekî jêhatî bi kar bîne da ku destkeftiyên xwe yên siyasî biparêzin.

Rola Tirkiyeyê di pêvajoya nû ya têkiliyên Amerîka û Sûriyeyê de girîng e û bi awayekî rasterast bi berjewendiyên wê yên li dijî HSD re têkildar e. Tirkiye, piştî hilweşandina rejîma Esed, bûye alîkarê herî nêzîk ê hikûmeta Şera û hewl dide ku profîla wî ya cîhanî mezin bike.

Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê, Hakan Fîdan, ji bo nîqaşkirina hevdîtina Şera û mijarên din, bi dîplomatên amerîkî û sûriyeyî re li Washingtonê civiya. Mijara van civînan kurd bûn. Tirkiye êdî bêyî ku veşêre li Sûriyeyê dijberiya kurdan tîne ziman. Ewil herî zêde HSD û YPGê dike rojev û bi vê re hewl dide ji xwe re qada siyasetê vebike. Eger di vê mijarê de bi ser bikeve wê dijminatiya xwe ya li dijî Rêveberiya Xweser bike. Diyare ku Tirkiye ji bo dikaribe Rêveberiya Xweser lawaz bike li pey stratejiyeke demdirêj û plankirî ye.

Dewleta tirk di çarçoveya vê stratejiyê de hewl dide ku xwe di sêgoşeya Amerîka, Sûriye, Tirkiyeyê de bi cih bike û bandora xwe li ser Sûriyeyê biparêze, nemaze li ser mijarên wekî herêma tampon ku ev demek dirêj e di rojava Erdogan de ye, ji nû ve germ bike. Lewma girîng e ku mirov gavên tên avêtin û nirxandinên li ser herêmê bi baldarî bişopîne.

Bêguman daxwaza Tirkiyeyê ya ku li herêmê bibe hêzeke serdest, ji gelek armancên stratejîk û ewlehiyê tê. Lê hebûna kurdan li pêşiya vê stratejiya xwe weke metirsiyekê dibîne. Bi taybetî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê rêxistinbûna kurdan li dijî berjewendiyên xwe dibîne. Li gorî wê, kurd li pêşiya projeya Osmaniya Nû ya stratejîk kelem in. Ji ber vê armanc dike ku li ser sînorê di navbera Bakur û Rojava de herêmeke tampon çêbike. Bi avakirina vê herêmê re bandora xwe zêde bike.

Divê em ji bîr nekin ku Sûriye ji bo Tirkiyeyê girîngiyeke stratejîk a dîrokî heye. Tirkiye dixwaze bibe aktorek sereke di vejandin û pêşeroja Sûriyeyê de, da ku di heman demê de bandora Îran û Rûsyayê kêm bike û bandora xwe li ser siyaseta Sûriyeyê misoger bike. Di çarçoveya vê xwestekê de, kurdan dike hincet û li herêmê hebûna xwe didomîne. Ger derfet bibîne wê êriş jî bike. Ji bo ku bikaribe êriş bike jî pêwîstî bi deshilatek nêzî xwe heye. Di halê heyî de, deshilata Şamê ji bo vê stratejiyê guncav e. Lewma Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyeyê, Hakan Fîdan, gav bi gav Ehmet El-Şera dişopîne. Şera li ku derê be Fîdan jî li wir xuya dibe. Ger gotin li cih be mîna hevkarê deshilata Şamê tevdigere.

Di nav van geşedanên dijwar de, kurd li Sûriyeyê divê bi stratejiyeke jêhatî tevbigerin da ku destkeftiyên xwe biparêzin û pêşeroja xwe ya Rêveberiya Xweser misoger bikin. Li dijî plan û projeyên qirêj ên li ser herêmên tên xêzkirin, pêwîst e ku Rêveberiya Xwser bi hemû hêz û aliyên xwe yên siyasî re li ser yek helwest û stratejiyeke hevpar li hev bike. Yekîtiya navxweyî ji bo danûstandinan hêza herî mezin e.

Di qonaxên wisa hasas de girîng e ku mirov siyaseta xwe tenê li ser danûstandinên bi dewletekê re ava neke. Pêwîst e ku têkiliyên xwe bi hêzên herêmî û navneteweyî yên din re jî xurt bike. Li gel vê divê danûstandinên bi Şamê re jî werin bipêşxistin û xurtkirin. Divê girîngiyê tenê nedin beşa leşkerî, bi giranî li ser nasnameya siyasî, çandî û makezagonî ya li Sûriyeya nû jî israr bikin. Naskirina fermî ya mafên kurdan û pêkhatiyên herêmê di destûrê de pêwîstiyeke sereke ye.

Divê Rêveberiya Xweser ji hêza xwe ya leşkerî wêdetir, hêza xwe ya medenî, rêveberî û siyasî xurt bike. Pêwîst e ku projeya rêveberiya xweser wekî modela îdarî ya pirneteweyî li herêmê bê nîşandan, da ku bikaribe piştgiriya navxweyî û navneteweyî werbigire.

Bi kurtasî, pêşketinên dawî nîşan didin ku Amerîka bi awayekî zêde ber bi yekîtiya Sûriyeyê ve diçe. Ev yek, ji bo kurdan qonaxa danûstandinên dijwar û stratejîk dide destpêkirin, ku divê ne tenê hêza xwe leşkerî, hêza dîplamatîk jî bê bikaranîn.

# Kurd di mihwera dîrokî de ne

Bar giran e û li ser milên rewşenbîriya kurd e. Divê medya, rojnamevan û nivîskarên kurd vê serdemê, fikir û ramanên ku wê paşerojê ronî bikin baş binirxînin û biparêzin



Medenî Ferho

Karwanê mirovaniyê di rêyek tarî de ye. Gotina sosyologan ku dibêjin, "Giyotîn şiyar e", nirx û pîroziyên mirovaniyê tune dike û gotina, "Ti bûyer li derveyî dîrokê namîne" parçe dike. Prof. Dr. Îsmet Şerîf Wanli, di pirtûka "Bi çavên gerhokên kevin ên rojavayî kurd û Kurdistan" de dibêje, "Bûyerên pêşerojan, ronahiya paşerojan in". Mixabin di gerênekên siyasî de, şerma dîrokî heye. Lewma min di hevoka destpêkê de, bayê hêviyên şikestî balivand.

Di sedsala 19mîn de 'şerê gotinê' heq dianî'; di sedsala 20an de, 'şerê gotinê' kete nîqaşên meşrûbûnê; di sedsala 21ê de, 'gotinê' meşruiyet wenda kir, çand, ehlaq, edelat, hiqûq jî kir xeşînên tarî.

Siyaset asîmîle bûye. Aqil û mêjiyê têgihiştî hatine tecrîdkirin; huner, pênûs, mêjiyên şiyar ber bi korbûnê ve hatine dafdan. Di vê serdema ku aktîvîzmên siyasî, barbariyeta komên çete û paramîlîter meşrû dikin, gelo dîrokzan, nivîskar û filozofên serdemê wê bikaribin "îtîbar-nirxên" gotinê, etîkên ehlaqî, nirxên çandê û hişmendiyê biparêzin? Yan wê weke Ibn-î Haldun, bêjin desthilatdarî "ateş-î suzan" e û birevin?

Têkoşîna kurdan a nîvsedsalê bûk Keştiya Nuh û herikîna çemê dîrokê guhert. Tevgera Azadiya Kurd dîrok nivîsî û zarokên kurdan jî bi wê dîrokê mezin bibin.

Bi taybetî di serdema êrîşa çeteyên DAIŞê de, tevahiya mirovaniyê "muzdarîb" bû û di Keştiya Nuh de, bi cih bû. Hem çarenûsa gelê kurd guherî, hem jî çarenûsa mirovaniyê guherî. Dîsa jî cîhan negihiştiye rêkûpêkiyê. Nijadperestiya netewe-dewletan û "kûlîbî"bûna dirinde ya bazirganî dixwaze civakê lal û ehmeq bike. Kor nake, ji bo ku kar bike, lal dike ji bo li mafên xwe nepirse.

**Balkêş e ku "Sêva Adem" jî hîn di destên gelê kurd de, di destê Tevgera Azadiya Kurd û di destê lîderê gelê kurd** de ye. Li cîhana ku bingeha wê li ser esasê hiqûqa "muesses-xwezayî" hatiye avakirin, ji aliyê mêjiyên newrotîk ve hatiye tunekirin û di destên utopîkên bazirgan de, bûye meteforza Ovidius.

Publius Ovidius Naso, helbestvanê Romayî ye. Bavê avakirina fikra metaforê ye. Bi efsaneya li ser qralê trakyayî Tereus nivîsiye û di çend pirtûkên din de, fikra metaforî daniye holê. Ez behsa metamorforza Franz Kafka, ya guhertina mirovan nakim.

**Metamorforza Ovidius civakî ye.**

Vêca, serokê Amerîkayê Donald Trump û cîhana wî ya "muhayyel" weke efsaneya qral Tereus e. Her çiqas gelek kes, dibêjin qanûna Trump bazirganî ye, ez vê nabêjim. Ji ber ku Trump bi arîtmetîka avakirina cîhanek înorganîk hereket dike. Çima vê dibêjim? Turmp weke siltanên ku bi navê xweda hereket dikirin, tevdigere û got ez ê şeran rawestînim û daxwaza Xelata Nobelê ya Aştiyê jî kir. Lê serokçeteyên paramilîter li Qesra Spî kirin mêvan. Li cihên ku şeran bide rawestandin, li dijî hin dewletan gefa şer dixwe. Ev tê wateya hem parastina




dewletên haydût, hem jî tê wateya avakirina "îstîbdad"a çeteyên DAIŞ û Talîbanê.

Rêveberiya Donald Turmp, di rojekê de sûcdariya "terorîst" a Colanî û wezîrê wî karên derve Şaybanî rakir. Ev helwesta siyasî, ne tekamul e, hîle ye û ti pirsgirêkan jî çareser nake.

Di suretî haliyeta "bazirganî û ûtopîk" de, teorîzekirina kurdan, hem li Amerîka, hem li Ewropayê dewam dike. Ev helwest, ji tetkîkê wêdetir, taktîk û kuştina realîteya Rojhilata Navîn û Cîhanê ye. Cenabê Muhammed jî dibêje, serwet-mal xerab e. Mirovan zalim dike. Ji bo vê jî cîhana misilman, êrişên dewleta "etrak-î bî îdrak"ên misilman li dijî kurdên misilman ji neditî ve tên. Misilmantî "îmtiyaz"a ji dayikbûnê jî qebûl nake. Lê îmtiyaza ji dayikbûna li welatên misilman, ne tenê ji bo zarokan, ji bo hêzên dewşirme û mirovên "misilman" jî zêde heye.

Bi gotinek filozofîk, felsefeyek çêkirî heye û ne li gorî "Şerîat-i Ahmediyê" ye. Yanî ne li gorî Şerîata pêxember Muhammed e. Belkî hin kes bêjin, kapîtalîzm, ji ideolojî û hişên şiyar nefret dike. Hêj ji mît û îhtîrasa mal û mewdan dike. Trump jî, ji ber zêdegaviyên Çînê û têkiliya bi Esed re, destek da serokçete El-Şara û Suriye radestî wî kir. Belkî rast e, lê pirsa, gelo di siyaseta li hemberî kurdan de, çima bi hesab û serxweşiya arîtmetîka civaka înorganîk hereket dike? Kurdan heysiyet-rûmeta mirovahiyê parast. Ewropa ji metirsiya çeteyên DAIŞê rizgar kir. Ev siyaset hem li dijî manzûmeya nirx û pîroziyan e, hem ne metodîk e.

Îro, ji komên paramilîter ên ku dewleta tirk ava kirine û wan destek dike, malbatên serokçeteyan li Tirkiyeyê diparêze û xwedî dike. Li dijî desthilatdariya Şamê şer dikin. Îdeologê selefî Ebû Muhammed el-Nakdîsî, fetwa "Şara kafir e" da. Piştî vê fetwayê, hejmara çeteyên radikal ku li dijî desthilatdara El-Şara derdiekvin zêtir bûne.

Wezîrê Karên Derve yê Amerîkayê Marco Rubio jî daxuyaniyek da û got, 'Suriye hîna ji pîkola çeteyên cîhadîst rizgar nebûye.' Li Suriyeyê, hêzên ku li dijî çeteyên cîhadîst şer dikin jî kurd in û gelên bi kurdan re ne.


Gelo kurd wê heta kengî bibin qurbanê romantîzma durû ya lîberalîzmê. Zembereka giyanê mirovaniyê wê heta kengî kilîtkirî be?

Her çiqas, kurd di serdema xwe ya "mihwer" de bin jî, li hemberî hemû otorîteyên dogmatîk têdikoşin. Ji bo vê jî divê di "muhsebeya wijdan û hiqûqî" de azad bibin. Di dibistana dîrokî de cih bigirin û ji felaketên şerîat û ji kiryarên mizoşîst rizgar bibin. Min gotina mihwer di çarçoveya felsefî de û bi wateya xwedîderketina li pêşerojê û avakirina wê bi kar anî. Ev jî tê wateya ku civaka kurd hem dîrokê çêdike û hem dîrokê dinivîse. Di demeke ku li çar aliyên cîhanê şer heye û dewlet ketina pêşbaziya çekkirinê de, birêz Abdullah Ocalan, bi banga Aştî û Civaka Demokratîk, pêvejoyek nû da destpêkirin. Tevî ku cîhana lîberal tecrîda li ser birêz Ocalan didomîne jî, wî deriyê bipêşxistina fikir û ramanên mirovahiyê vekir.

Ev jî tê wê wateyê ku hemû pêngavên reformên hunerî û siyasî, di çarçoveya mihweriya mirov, bi taybetî mihweriya jinê dike navenda civakê.

Nazîzm û faşîzm bûye giyotina serdemê û şiyar e. Kurd jî di nav de, tevahiya mirovahiyê di bin metirsiyeke mezin de ye. Bar giran e û bar li ser milên rewşenbîriya kurd e. Divê medya, rojnamevan û nivîskarên kurd vê serdemê, fikir û ramanên ku wê pêşerojê ronî bikin, baş binirxînin û biparêzin. Divê kurd, hem bibin çakûç, hem bi bibin sidan!

# Pêngav bi pêngav



Hesen Huseyîn Denîz

Şanîdar şikefteke li başûrê Kurdistanê, li herêma Bradostê ye, ku salên 1950-60î hat kifşkirin û kolandin. Li vê derê bermayiyên berî niha bi 65-35 hezar salan ên mirovên Neandertal, ku wek destpêka mirovbûnê tê nasîn hat dîtin. Neandertal bi hev re jiyane, bi hev re danûstendin kirine, bîrûbawerî parvekirine û ji bermayiyên kulîlk û polenan tê fêhmkirin ku hest, raman bi pêş de birine û karûbarên hevpar kirine.

Piştre sedsal û hezar sal derbas dibin û Neandertal ciyê xwe ji Homo Sapiens re dihêlin. Arkeolog bi pey şopa Homo Sapiensan dikevin û wan jî dîsa li Kurdistanê li kêleka çemê Şanîdar, Jermo, Zawî yê li herêma Bradost û Silêmanî, li bakurê Kurdistanê jî li Girê Mirazan, li Erxeniyê, li Heranê û li gelek deverên din ên navbera Dîjle û Firatê û ji rêzeçiyayên Zagrosan heta Torosan dibînin, ku ev yek heta berî zayînê bi duwazdeh hezar salan didome. Homo Sapiens di van salan de, êdî li Kurdistanê niştecih dibe; çand, huner, wêje û bîrûbaweriyê bi pêş de dibe û bi dîtina nivîsê ya li jêra Mezopotamyayê deriyekî nû li ber mirovahiyê vedike.

Piştre şaristanî bi bajarvanî, dewlet, artêş, binesazî û avahîsaziyê dest pê kir; bajardewletên wek Ûr, Ûrûk, Sumer, Akad, Babîl, Asûr, Med, Pers û Roma derketin holê. Şaristanî bi pêş ket, sazûmana koledarî û bûyera bîrûbaweriyên olî û ramana demokrasî û azadiyê bi pêş ket.

Dîsa ji aliyê dîroknas û arkeologan ve tê dîtin ku Kurdistan dilê van pêşketinan e. Ji van pêşketinan em çi fêhm dikin: Mirovên îro em wek kurd bi nav dikin ne kêmî 65 hezar sal in, li ser vê axê jiyane. Van mirovan bi hev re jiyan ava kirine, bi hev re keniyane, bi hev re giriyane, bi hev re çûne nêçîrê, bi hev re erd kolane û çandinî kirine; bi hev re xwedawend afirandine û baweriya xwe pêk anîne, bi hev re şer û aştî kirine, bi hev re şîn û şahî jiyane, bi hev re alavên jiyanê afirandine û bi kar anîne; bi hev re raman, ziman, wêje bi pêş de birine û bi hev re bûne xwediyê çand û dîrokeke hevbeş û hunereke bêhempa.


**Kurd mirovên li ser vê axê ne**

Di van 65 hezar salan de, kurd ji roja dapîr û bapîrên wan ên Neandertal ketine şikefta Şanîdar heta îro li ser heman axê jiyane. Kurd ne ji ciyekî din hatine ser axa Kurdistanê, ne zimanek û peyvên vî zimanên ji deverên din dizîne, ne jî ji nav miletên din zarok anîne û veguhertine. Kurd orjînal mirovên li ser vê axê ne, ku bi guherîn û veguherîna 65 hezar salan, bi zimanê xwe yê dewlemend, bi çanda xwe ya dergûşa mirovahiyê heta roja me hatine. Ji bo wê Kurd mirovine şareza, dîrokî, neteweke hevgirtî yê xwediyê çand, dîrok, erdnîgarî, aborî, raman, ziman, huner û hestên hevbeş ên 65 hezar salan in.

**Li ruyê dîrokê mînaka wê tune**

Gava ku gelek gel, qewm û miletên din netewbûna xwe hîn piştî zayînê bi hezar - du hezar salan didin destpêkirin û pêk tînin, kurd ji dîrokê ve bi hezarên salan û vir ve tov û bingehên netewbûnê bi xwe re tînin. Li ser ruyê cîhanê neteweke din ê xwediyê dîrokeke wisa dewlemend a rehên xwe berdide kûrahiya dîrokê tine ye. Ji bo wê, divê kurd bi xwe, bi dîrok, çand, ziman, huner, erdnîgarî û hebûna xwe serbilind, bixwebawer û serfiraz bin.

Her çendî di sed salên dawî de ji aliyê sermayedarî, emperyalîzm, kolonyalîzm û desthilatdariyên cîhanî û herêmî ve hebûna kurdan hatibe înkarkirin û hemû mafên wan hatibin xwarin jî, ev yek nikare rastiya dîroka kurdan a li Kurdistanê hatiye jiyîn, biveşêre û înkar bike. Ger îro şaristanî gihîştibe asta bikaranîna hişê dîjîtal, deyndarê Neandertalên dapîr û bapîrên kurdan in ku di şikefta Şanîdarê de kulîlk dane destên hev .



**Rastiya kurdan 65 hezar sal in heye**

Divê mirov bi vê rastiyê li bûyera têgihên 'hebûn' û 'înkar'a kurdan binêre. Înkarkirina hebûna kurdan ev sed û du sal in dest pê kiriye, lê rastiya hebûna kurdan ev 65 hezar sal in heye. Kurd îro hewl didin vê rastiya 65 hezar salî bixin şûna înkara sed û du salan. Înkar ewçendî dijwar û dilşewat e ku li hember kombûna çanda 65 hezar salan wek agirê bigire zeviya genimê seridî lê diçe. Ger rehên çand û zimanê kurdî direjî kûrahiya dîrokê nebûya, niha li holê ne kurd, ne kurdî, ne jî Kurdistan dima, lê tevî agirê asîmîlasyonê, tevî kuştin, girtin, qirkirin û înkar û îmhayê, kurd, kurdî, Kurdistan li ser xwe ne û wek rojê her sibeh derdikeve.

Di van sed û du salan de kurdan bi her awayî li ber xwe da. Berxwedaneke bêhempa li giştiya Kurdistanê bi pêş ket; çi bi şer, çi bi hest û raman, kurd têk neçûn, zindî man û niha gihiştin asta, ku ji tirk, ereb û farisan re bibêjin, «binêre ez heme, wek tava rojê dibiriqim, min bibîne û bipejirîne».


Birêz Ocalan jî vê rastiyê di hevdîtina xwe ya dawî de bi vî awayî derdixe pêş û dibêje, ''Divê hebûna kurdan bi hemû aliyên xwe ji aliyê zagona komarê ve were pejirandin.'' Wateya vê: dawîlêanîna polîtîkaya înkarê û pejirandina hebûna kurdan e. Gava komara Tirkiyeyê kurdan wek hebûnekê bipejirîne, ew ê bibe pêngava yekemîn a bidawîlêanîna siyaset û pêkanîna înkar û îmhaya sed û du salan. Heta dewlet hebûnekê nepejirîne, mirov nikare li ser dayîna mafên wê jî biaxive. Piştî pejirandina 'hebûna kurd' êdî pêngava duyemîn a dayîna mafên vê hebûnê wê werin holê. Piştre di pêngava sêyemîn de jî bikaranîna van mafan û di pêngava çaran de bicihkirin û berfirehkirina van gavan wê were rojevê. Kurd wisa pêngav bi pêngav wê rastiya xwe ya 65 hezar salan a neteweke qedîm û dewlemend bixin şûna înkar û îmhaya sed û du salan a dagirkeriyan û bi vî awayî wê xwe bigihînin maf û rûmeta xwe.

# Derûnnasiya entegrasyona şervanên azadiyê!

Ezmûna gelek gerîlayan a di warê dîsîplîn, rêxistin û giyanê sivîl di saziyên reformkirî de dikare sûdê bide her kesî. Qebûlkirina giştî ya êşa herdu aliyan û rêûresmên rêzdar ên derbasbûnê dibin alîkar ku rûmeta xwe biparêzin



Prof. Dr.
Abdulîllah Polat



Trawma birîneke psîkolojîk e: pergala demarî dikeve rewşek hişyariya zêde, moda şer, revîn, an cemidandinê. Entegrasyon tê wateya vegerandina vê tengezariyê bo herikînek saxlem li şûna tepeserkirina wê. Ji hêla psîkolojîk ve, ev bi dîtina rêya xwe ya ewle ji hêla laş ve, destpêkirina tevgerê, ezmûna têkiliyên piştgir, hişyarbûn û fêrbûna ji têgihîştinê pêk tê. Ji hêla sosyolojîk ve, hewcedariya bi cihên ku mirov dikarin wate, aîdiyet û rolên bibandor bibînin heye. Ji hêla siyasî ve, hewcedariya bi qaîdeyên ku parastinê peyda dikin û cihêrengiyê qebûl dikin heye. Şîfaya hundirîn û edaleta derve bi hev re diçin.

Ji bo kurdan, ev pirsgirêk pir rast e. Dehsalên şer, sirgûnî, îşkence, xizanî û sînorkirinên ziman ne tenê kesan, lê di heman demê de şekil daye nifş, malbat û gundan jî. 'Pergala demarî' ya kolektîf di hişyariyek bilind de ye: bêxewî, bêewlehî, hêrs û şerm bi hev ve girêdayî ne, mîna rûmet, mêvanperwerî, mîzah, dengbêj, newroz û hêza jinan. Ev çavkanî şûna mafan nagirin; ev pirên navberyî ne ku maf dikarin lê werin avakirin. Demên dîrokî yên wekî bêdengkirina çekan û hilweşandina rêxistinê derfetan diafirînin. Ji bo ku ev gavên sembolîk bibin rastî, divê Tirkiye û Sûriye çarçoveyek qanûnî ya zelal ava bikin. Divê beşdariya demokratîk, parastina ziman, rêxistina siyasî ya biewle, qanûnên dadperwer, pêvajoyên rastî û hesabdayînê û avahiyên ewlehiyê yên ku bi gel re dixebitin werin bicihkirin. Entegrasyon li vir bi aşkere nayê wateya asîmîlasyonê, ew li ser naskirina nasnameya kurd di nav saziyên hevpar û pêbawer de ye.

Ji ber vê yekê şervanên azadiyê çawa dikarin bêyî ku rûmeta wan têk biçe werin entegrekirin? Bi naskirina takekesî û doza wan, lê her wiha bi nirxandina tundûtûjiyê li gorî serdestiya qanûnê. Rûmet tê wateya 'ji nû ve nivîsandina' bi zorê ya biyografiya kesekî, ne şermezarkirin an sûcdariya kolektîf. Di şûna wê de, qanûnên zelal hewce ne ku nirxandina takekesî bidin pêş, kesan biparêzin, sûcdar hesab bidin û deriyan ji jiyana sivîl re vebikin. Bêçekkirin, bêmobîlîzekirin û ji nû ve entegrekirina nav civakê ne teslîmbûn, lê guhertina rolê ye.

***Ji berpirsiyariya leşkerî ber bi berpirsyariya sivîl-siyasî ve***

Ezmûna gelek gerîlayan a di warê dîsîplîn, rêxistin û giyanê sivîl di saziyên reformkirî de (hikûmet, şaredarî, alîkariya karesatan û heta ewlehiya ji nû ve profesyonelkirî di bin çavdêriya sivîl de) dikare sûdê bide her kesî. Qebûlkirina giştî ya êşa herdu aliyan û rêûresmên rêzdar ên derbasbûnê dibin alîkar ku rûmeta xwe biparêzin. Rastî û başbûn divê bi hev re werin nirxandin û ravekirina van sedeman, mîna ku statuya qanûnî hewce dike, divê ji ber sedemên psîkolojîk, giyanî û exlaqî neyê paşguhkirin. Ev faktorên girîng in.

Çima ev rêya rêzdar pêwîst e? Ji hêla psîkolojîk ve, şerm berxwedanê zêde dike û pergala demarî dixe rewşek hişyariyê ya bilind; rûmet û ewlehî hişmendî, fêrbûn û xwekontrolkirinê teşwîq dike. Ji hêla sosyolojîk ve, stîgma mirovan marjînalîze dike û çerxên tundûtûjiyê gur dike. Ew di heman demê de hestek aîdiyetê, kar û perwerdehiyê, girêdan û berpirsyariyê diafirîne. Ji hêla siyasî ve, pêvajoyên aştiyê dema ku şervanên berê di nav serweriya qanûnê de tên entegrekirin, mafên hindikahiyan tên parastin, û rêveberiya xweser a herêmî bi saziyên neteweyî ve girêdayî ye, aramtir in. Lêkolîna li ser peymanên aştiyê nîşan dide ku peyman domdartir in dema ku şervanên berê kanalên rewa ji bo beşdarbûnê dibînin û mafên qurbaniyan tên pêşînkirin.

Ji bo civaka me, ev tê wateya veguherînek ji afirandinê ber bi rûmetê ve. Entegrasyona navxweyî (bêhn, laş, girêdan, têgihîştin) li hev tên û yekbûna derveyî (qanûn, temsîl, ewlehî) dicive. Bi vî awayî, enerjiya jiyanê dibe hêzek ku pêşerojê şekil dide. Bêhn dibe dengek di parlementoyê de. Laş di qadên giştî de parastinê dibîne. Têkiliyên di navbera cîran û rayedaran de vediguherin baweriyê. Têgihîştin rê li ber reformên ku cihêrengiyê diparêzin vedike. Rûmet tê wateya ku kes nayê mehkûmkirin, berpirsiyarî bi zelalî tê destnîşankirin û pêşeroj vekirî dimîne. Tewra ew kesên ku carekê têkoşiyane jî dikarin wekî welatiyan (bêyî ku rûmeta xwe wenda bikin) bi maf û berpirsiyariyên xwe di çarçoveya serdestiya hiqûqê de vegerin: çalakî li şûna înkarkirinê, edalet bêyî tolhildanê, lihevhatin bêyî jibîrkirinê. Reqs û raman, dil û hiş di heman rêyê de dimeşin: ne li dijî kesî, lê ji bo pêşerojek azad, ewle û cihêreng- kurd, demokratîk, bi hev re. Jin, jiyan, azadî- wekî pratîkek rojane ya parastin, beşdarbûn û rêzgirtinê.

# Mêjî, raman, ronahî û desthilatdarî


Yaşar
Eroglu



Hişmendî, ramandin û afirandinê mirovahî ji heyama hovîtiyê aniye, gihandiye serdema pêzanîna çêkirî (hişê çêkirî). Jêdera van hemû geşedanan mêjî ye. Mêjî hem aliyê mirovan ê biyolojîk bi rê ve dibe, hem jî pêvajoya afirandina hişmendî û ramandinê. Pergala ramandinê yanî bi rêk û pêk û domdar pêkhatina ramanê dibe hişmendî. Hişmendî qata herî jor a mêjî ye. Pêzanîn (zeka) herî zû û berfireh têgihiştina rewş, têgih û agahiyê ye. Hiş, bi rêk û pêk û rast bikaranîn û birêvebirina pêzanînê ye.

Pêşketina berhilînê hişmendiyê diyar dike. Hişmendî rasterast bi pêşketina berhilînê re girêdayî ye. Lê mercên taybet ên hişmendiyê û cur bi cur cureyên hişmendiyê derdixin holê jî hene. Em dikarin felsefe, zanist, îdeolojî, siyaset, ol, wêje û hunerê weke cureyên hişmendiyê mînak bidin. Şertên ku hişmendî û cureyên hişmendiyê derdixin holê berhilîna pêşketî, azadî û kesên di bin mercên azad de gihiştî ne. Ji bilî kesên awarte, di civakên paşmayî de hişmendiya pêşketî dernakeve. Qada hişmendiyê kesên ji çîna desthiladar re dimîne. Ji ber wê ye ku di serdemên berê de û parek îro jî fîlozof, ramanwêr, zanist, hunermend, wêjerist ji dorhêla çîna serdest derketine. Yên xwedî derfet û şertên serbest û azad ew in.

Lê belê ji sedsala 20an û vir ve çînên serdest ji ber desthilatê û zêdekirina sermayeya xwe pêşiya xwendin û perwerdeyê vekirin, hişmendiyeke giştî û berfireh pê re pêk hat. Bi pêşketina heyama teknolojîk, qada dîtbarî, dîjîtal, ragihandinê re derfetên qada hişmendiyê pir û berfireh bûn. Pergala serdest li gorî berjewendiyên xwe yên aborî, siyasî, çandî û îdeolojîk sînorên nixumandî bi qanûn, perwerdeya alîgir, lidarxistina çanda kozmopolît û hwd danîn pêşiya van geşedanên ku hişmendî pêş dixistin. Her tim modelên li gorî berjewendiyên xwe mirov gihandin: Mirovên ku nikarin bifikirin, îtîatkar, li pey projeyên wan araste dibin, her tiştî di pêşxistina takekesî de dibînin, hişê wan tevlihev û bêronahî afirandin. Di qada wêje, huner, çand û civakî de ev yek pêk anîn. Çînên serdest ji bo serwerî û desthilatdariya xwe civakeke îtaatkar û bêbertek



dixwazin. Sedsalên berê bi zor û sîtemkariyê, piştî desthilatdariya pergala sosyalîst bi polîtîkayên nixumandî û perdekirinê serweriya xwe didomînin.

Mêjî û ramandina ku berhema mêjî ye, di hedefa wan de ye. Mêjî; ramandin, îdeolojî û ronahiyê diafirîne. Raman jî, ji bo serdestan xetereya siyaset û pê re rêxistinkirinê bi xwe re tîne. Rêxistin liv û lebat e, enerjiya pêşveçûn û guherînê ye. Hemû jî ji bo textê serweriyê, xetereyên mezin in. Ji dîroka serwerî û têkoşîna bindestan dersên giran derxistiye. Ji bo bi xetereyê re rû bi rû nemîne hemû amûrên li ser mêjî bandor dikin dixe dewreyê. Di serî de perwedeya birêxistinkirî, ya berbelayî, ragihandin, telekomîkasyon, teknolojî û hemû amûrên din bi kar tîne.

Mêjî robarekî mirêsdar e, navenda sereke ya ramandinê ye. Tarî şev e, kor e, pêşiyê nabîne. Ji bo ku bibîne divê binêre. Nêrîn arastebûna dîtina hawira ku mirov di nav de ye. Mêjî tarî be, hewldan û mecala nêrînê tune be yan jî hatibe tunekirin, nikare bibîne, ji dîtinê re kor e, tarî ye, şevereş e. Dîtin tevgera mêjî ya pasîf e. Dîtin karê jixweber e, mirov nexwaze jî dibîne, derdor li ber çavan dikeve. Lê nêrîn daxwaza dîtinê ye, balkişandin e, tevgereke hişmendî ye. Balkişandin meraq e, eleqe ye; meraq û eleqe riya lêpirsînê vedike. Mêjî li bersivên wan pirsan digere, dibîne, di bêjinga xwe re derbas dike, eger gihiştibe dahûrandinekê lempeyên mêjî yekser vêdikevin û bergeh ronî dibe. Ango mêjiyê fonksiyonel weke lempeyeke roniyê ye; duh, îro û pêşerojê dibîne.

Serwer û serdest hişyar in, zana û bi hişmend in. Di serdema îro de, ne bi zorê; bi rêya pewerdeya piralî, ragihandin, medya, teknolojiyê û hwd plan, proje û polîtîkayên qada aborî, siyasî, çandî, civakî û hwd diafirînin, disêwirînin ku pêşî li vê pêvajoya liv û lebata mêjî bigirin. Çek û teknolojiya şer hemîn di bêrîka wan de ye lê îro zêdetir girîngiyê didin arastekirina mêjî. Bi milyaran dolar, euro, lîra ji bo van polîtîka, plan û projeyan xerc dikin. Takekesî, kozmopolîtîzm, post-modernîzm, jiyana bêhêvî heta hişbiriya madî (esrar, kokain hwd) û derûnî di jiyana siyasî, çandî, civakî de bi pêş dixin.

Bi awayekî nixumandî bi fonksiyonên mêjî dilîzin. Heta ji destê wan tê hewl didin ku mêjî nefikire, şaş bifikire, bitevize. Hewl didin ku mirov, bi taybetî nifşên ciwan, mêjiyên hê dirûv negirtine, dilmeyî ne ji hedefên wan ber bi mebestên xwe araste bikin, bikin îtaatkar, nebin muxalif li kêleka armancên wan cih bigirin, rol bilîzin.

Serdestiya ku vê yekê herî zêde û karîger pêk tîne dewlet û desthilatdariya Tirkiyeyê ye. Di deh salên dawiyê de tundî, çewisandin û polîtîkayên tevizandinê, îtaatkirinê bi koordîne bi kar anîn. Yekser mêjî hedef girtin, arastekirina mêjî kirin hedefa xwe. Dîn û pewerde li hev anîn, diyanet, cemaatên olî li rex bi cih kirin. Bi dirûşma, 'Em ê nifşên dîndar bigihînin'. Polîtîka û projeyên tevizandin û îtaatkirinê derxistin pêş. Di encamê de civak tevizandin, îtaatkarî pêk anîn. Civak anîn li hember hev, civak tenê bi pirsgirêkên debarê re mijûl e, bê bertek e. Civaka kurd a aktîf jî ji vê rewşê bi bandor bû. Niha birçîbûn, bêdebarî, xizaniyê serê xwe girtiye, gumrah dibe. Fihûş, hişbirî, nelirêtî, gendelî, bêhiqûqî, kêfitiya desthilatdariyê, kuştinên jinan, xwekuştin û rizîna civakê bûye asayî. Ji ber polîtîka û planên ku mêjî hedef girtin, civakeke bêbertek, îtaatkar, tevizî û rizyayî derketiye holê ku êdî nikare bilive. Ji ber ku bi genên mêjiyê wê hat lîstin.

Em di mînaka desthilatdariya Tirkiyeyê de dibînin ku mêjî, raman û ronahî çiqas girîng in û hêzên serwer û serdest çima wan hedef digirin.

# Huqûqê hêzan

Tirkîya de krîzê huqûqî ramîno. Hêzê serdestî qanûnan seba menfaetanê xo virazenê û huqûqî binê linganê xo de pelixnenê. Komel hewcedarê huqûqê hêzan nê, hêzê huqûqî yo

Merkezê Xeberan



Teorîsyeno bolşevîk Vladîmîr Îlîç Lenîn fikrîyeno ke her dewlete eslê xo de şarî rê nê, sinifanê serdestan rê xizmet kena û sey "hacetê teda" yena şuxilnayene. Na çarçewa de kitabê Buharîn û Preobrajenskî yê "Alfabeya Komunîzmî" de zî nusîyeno ke kapîtalîzm de dewlete "rêxistina" sinifanê sermayedaran a. Yanî heme artêşe, polîs, unîversîteyî, yewinê îstîxbaratî, zîndanî, medya, mehkemeyî seba menfaetanê sermaye yenê sazkerdene. Coka pergalê kapîtalîzmî de "huqûqo xoser" yan azadîya hukmî çin a. Gama ke bitaybetî dewayê sîyasî abenê, muhakemekerdiş beno û birî gêrîyenê, hertim goreyê îqtîdarê sermayedaran yeno têgêrayene. Artêşe û polîs eslê xo de asayîşê hêzanê serdestan pawenê. Unîversîteyan de perwerde seba ke wendekarî şêrê burjuwazî rê xizmetkarîye bikerê dîyeno. Zîndanan de êyê ke vera îqtîdarê sermayedaran şer kenê est ê. Medya de hertim propogandayê sinifanê serdestan virazîyeno. Mehkemeyan de dozger û dadgerî "emirberîya" sinifa burjuwazî kenê.

Tirkîya de zî pergalo kapîtalîst est o. Hêzê huqûqî nê, huqûqê hêzan est o. Qanûnê dewleta tirke manenê "marî", têna înanê ke lingerut ê gaz kenê. Rejîmê hêzan de lingerutan rê ca çin o. Ê raştê her tewr cîyakerîye, serdestîye, zordestîye û zulmî yenê. Mîyanê lingerutanê Tirkîya de elewîyî, kurdî, sosyalîstî û pêro kêmneteweyîyî est ê. Qanûnî têna vera înan yenê xebitnayene. Serdestî û êyê ke serdestanê rê xizmetkarîye kenê, nênê muhakemekerdene. Mîsal nika Tirkîya de yew dozger est o, nameyê (Akin Gurlek) ci zaf "namdar o". Gurlek sembolê pergalê pûçbîyayeyî yo û goreyê huqûqî nê, bi emirê otokratî têgêreno. Otokrat kemane cineno, dozger û dadgerî reqs kenê. Goreyê maddeya 140. ya qanûnê bingeyî ganî dozger karê xo yê fermî ra teber çîyêkê bînî yê fermî û taybetî nêkero. La ame zelalkerdene ke dozger mîyanê şîrketa Etî Madenî de kar keno. Rixmo ke na rewşe zanîyena, vera Akin Gurlekî çi tehqîqatêk nêvirazîyeno. Hetêk ra Gurlek seba otokratî "qanûnan" ano ca, hetêkê bînî ra vera ey qanûnî nênê caardene. Tîya de ne huqûq ne edalet ne zî muhakemekerdiş est o. Têna qanûnê daristanî derbasdar o.

**Dewaya Selçuk Mizrakli**

Komedyaya huqûqê Tirkîya çend rojan verî Hemşaredarê Şaristanê Girdî yê Amedî yo verên Selçuk Mizrakli ser o zî zelal bîye. DEM Partî seba vengdayîşê Mizrakli beşdarîye kerde, labelê Mizrakli nêame tehlîyekerdene. Heyetê Çimdarîye û Îdare yê Zîndanî na eşkerayîye kerde: "Demê tepiştişê xo de derheqê abirîyayîşê xo yê rêxistine de beyan nêda". Yanî heyet vano ke wa Mizrakli bêro û ma rê "roxonayoxîye" bikero. No reftarê heyetî yo gemarin armanc keno ke îradeyê merdimî bişikno. Na hişmendîye duştê Prosesê Aştîye û Komelê Demokratîkî ya. Rayapêroyîya Tirkîya û Kurdîstanî pawena ke huqûq bêro caardene û xoserîya hukmî bibo, la îqtîdar hema zî vera sîyasetmedaranê kurdan teda û zextan keno, înan zîndanan de tepişeno. No nêzdîbîyayîş ameyoxê têduşt û azadî rê xizmet nêkeno. No nêzdîbîyayîş hişmendîya merkezperest û tedakere temsîl keno.

# Dewlete çirê gaman nêerzena? (II)



Mehmet Şahîn

Bêguman azadîya fîzîkî ya Rêzdar Abdullah Ocalanî şertêko esasî nîyo. La qabê averşîyayîşê nê prosesî û qabê famkerdişê nîyetê dewleta tirke ferz o û mecbûrîyet o. Belê raray bi Rêzdar Abdulah Ocalanî dir pêvînayîşî pêk yenê la ena nîna manaya çinêbîyayîşê tecrîdî. Tecrîd bi heme xidarîya xo verdewam keno. Fikr û ramanê Rêzdar Abdullah Ocalanî hemayke binê tecrîdî de yê. Dewleta tirke hemayke fikr û ramanê Rêzdar Abdullah Ocalanî ra tersena. Û bi nê tecrîdî nêverdenê ke têkilîya Rêzdar Abdullah Ocalanî bi şaranê Tirkîya dir virazîyo û şar tewrê prosesê Aştî û Komelê Demokratîkî bibo.

Di nê prosesî de herî zêde çekuyanê aştî, entegrasyon û demokrasî ser nîqaşî est ê. Çiyo ke dewlete aştî ra fam kena û çiyo ke kurdî aştî ra fam kenê yewbînan ra dûrî yê. Aştî beyntarê 2 peran de aver şina û bi gameştişê wirdî peran xurt bena. Badê nê gamanê tarîxî yê kurdan hewce keno ke dewleteyke qabê şinasnayê vînê kurdan û qabê heqanê kurdan ê sîyasî û komelkî yê herî rewayan tay gamanê hiqûqîyan bierzo. Ma heme zanê ke aştî tenê bi ronayîşê çekanê HPG'yî nîna.

Etya de çekûya Rêzdar Abdullah Ocalanî ya "entegrasyono demokratîk" zaf muhîm a. Sankî entegrasyono demokratîk fina ke wa gerîla çekanê xo rono û bêro tewirê cuya komelkî bibo. Entegrasyono demokratîk o ke Rêzdar Abdullah Ocalan vano ono nîyo. Rêzdar Ocalan vano wa heme gerîlayî bêrê tewirê têkoşînê sîyasî bibê. Yanî wa şert û mercê sîyasetê azadî virazîyo. Wa kurdî bieşkê bi awayêko azad sîyaset bikerê.

Di nê prosesî de xala herî muhîm yewî ke Rojawan û Sûrîye yê. Muzakereyê beyntarê Herêma Xoserî û desthilatdarîya Şamî de verdewam kenê. Bi qaso ke ma çapemenî de vînenê di heme pêvînayîşan de temsîlîyetê cinîyan kî est o û vîna rêxistina cinîyan kî di çareserî de esas yeno girotiş. Ono eyseno ke badê pêvînayîşê Erdogan û Trumpî Sûrîye de lez dayo prosesî. Di çarçoweya peymana 10'ê adare de wazenê QSD tay gamanê şênberan bierzo. Loma QSD ser o zext û zor est o. Hêrişê ke Heleb û bendawa Tişrînî de pêk ameyî, parçeyêkê na polîtîkaya zext û zorî bî. Hetê bînî ra qabê îqnakerdişê QSD'yî zext û zorê Amerîka kî est ê. Her çiqas raştaraşt xoserîya herêmî red nêkerê ke wazenê QSD bi çiyo herî qiçkek razî bikerê.

Vanê ke xoserîya herêmî gorê Sûrîye nîya, gorê şaranê Sûrîye nîya... La êyê ke zanê ke di zaf dewletanê cîhanî de xoserîya herêmî fina pergalêkê herî rewa di merîyet de ya. Di Îspanya de, Îskoçya de, Swîss de û zaf dewletan de pergalê xoserîya herêmî est o. Bi ser de di Amerîka û zaf dewletanê Ewropa de modelê rayberîyanê herêmî yê federasyonan est o. Modelo ke heme dinya de beno gelo çîrê Rojawan de nêbeno. Esil mesela nêbîyayîş nîyo, esil mesela nîyetê înano xirab o. Yo ke nêverdeno virazîyo û vano nêbeno nîyetê Amerîka û dewleta tirk o xirab o.

Di menga vîyarte de KKTC (Qibris) de weçînayîş virazîya. KKTC de tenê 400 hezar kes cuyeno. Dewleta tirke qabê 400 hezar kesî federasyonî kî qebûl nêkena, dewletêka serbixo wazena. La Rojawan de bi mîlyonan kes cuyeno û dewleta tirke vîna înan nêşinasnena. Xoserîya herêmî ya ke kurdan bi gunîya 10 hezaran şehîdan bidest vista wazena çînê bikero. Kurdan ra vana çekanê xo ronê û şêrê teslîmê qatîlanê xo bibê. Dewleta tirk a ke Qibris de federasyonî red kena û dewleta serbixo wazena, Rojawan de Xoserîya Herêmî qebûl nêkena û qabê çinêkerdişê xoserîya Rojawanî çi dest ra yeno kena. Demo ke babete bena kurdî, nêeşkenê nîjadperestîya xo ya seserran bilimnê. Demildest dest bi gefan û şantajan kenê. Dewleta tirke di çar parçeyanê Kurdîstanî de hemay ke qabê verdewamê polîtîkaya qirkerdiş û çinêkerdişê kurdan a seserre xebetyena.

Ma heme zanê ke şoreşê Rojawanî bi ked û xoverdêrîya cinîya kurde û bi bedelêko zaf giran pêk amo. Bi keda heme şaranê enternasyolîstan Rojawan de pergalêko demokratîk awan bîyo. Rayberîya herêma xoserî ya Rojawanî vînê heme şaran û heme bawerîyan temsîl kena. Serkewtişê pergalê Rojawanî serkewtişê heme cinîyan û şaran o. Pawitişê pergalê Rojawanî pawitişê rûmetê merdimahî yo, pawitişê komelê azadî yo.



Murat Tunekiragij

# Estîya komelî

Merdim fikre xo û xo şinasnayîş reydi est o. Înê dehebîn xûsusîyeton xo reydi gonîyonê bînon ra ciya beno. Yew babete ser o fikrîyayîş, cuye sazkerdiş yan zî xo viraştiş xûsusîyetê merdimon î. Merdim inehewa encax eşkeno xo viraZo. Averşîyayîşê fikron, sazkerdişê fikron, ewnîyayîşê raştî reydi cuye mîyon de yew sîstem virazîyeno. Çiyê cîyayî tîhet omeyîş reydi rêroye virazenê. Na pêroyê reydi cuye hem menaya xo vênena hem zî rind bena.

Merdim xo şinasnayîş û menaya cuye fehmkerdiş reydi cuye fehm keno. Merdim ke menaya cuye fehm kerde, aye merdim ra ma eşkenê vacê xo zono, xo şinasneno. Çina ra ma înehewa vonê? Çi îdeolojî, paradîgma yan zî fikr beno wa bibo encax cuye mîyon de pratik (fîraze) de ceribîyeno. Raştê aye çi yo înehewa bewlo bena. Fikro ke, îdeolojîya ke yan zî paradîgmaya ke cuye mîyon de îspat nêbîya, şarê mîyon de qebul nêbena. Merdim zî estbîyayîşê xo komel mîyon de fehm keno nê fikron reydi. Nasnameyê ey yê şexsî zî komel mîyon de virazîyeno, aîdîyetê ey zî hîna aver şono. Şexs komel mîyon de înehewa xo virazeno û komel reydi xo yeno. No sebeb ra ma nêeşkenê komel û şexsî yewbînî ra cîya bikerê. Komel û şexsî ser o waxto ke ma yew çiyî qal bikerê, gerek ma bozenê beyntarê ayenî de yew pêroyê est a.

Cuye mîyon de çîyo ke ma îdare keno, hetayê ma bewlo keno ewnîyayîş maya. Ma senîhewa ewnîyenê cîhan û gerdûn cuya ma zî înehewa cîyet (şekîl) gêno. Merdimon timo waşt ke dormarê ayenî de se beno çinê beno fehm bikerê. Heyon dormarê xo fehm kerdo, xo zî fehm kerdo. Tarîx ra heyon ewro zî çîyo ke merdim têger visto nê fikr ê. Nê fikr pîl û hêzonon reydi omeyo na daraxe.

Mîyonê komelî de dehebe fikrî est ê. Fikro yewin mezgê dewlete reydi cîyet beno. Fikro diyin zî gorebê komelî virazîyeno û cîyet beno. Toyê fikrî est ê ke cuye xo rê binge gênê, gorebê averşîyayîşê cuye heme çîyanê xo bewlo kenê yan zî pirsgirekî est ê ke mîyonê cuye de gorebê qeydeyon komel ayenê çareser benê. Hima nê fikron ra teber mîyonê komelî de hîna zafê mezgê dewlete ma şuxulnenê. Ma zafê tesîrê nê mezgî de mendî û monenê. Çina ra? No mezg ponchinzar serrano destonê serdeston reydi verba şaron yeno şuxulnayîş. Fikrê ma, mezgê ma ronîştiş û varîştişê ma tomo serdeston bewlo kerdo. Çiqas ke ma roje mîyon de ayenî ra çina bonder bîyî, ma aye binge girewta û gorebê aye mezgî cuya xo rê dewam kerdo. Ma ra vato raşt înaya ma zî vato qey raşt vateyê serdeston o. Ma ne vateyonê serdeston ser o fikrîyayî ne zî ma vato inî vateyî raşt nêyê. Mezgê dewlete çina wo? Çina binge gêno. Heme çiyî ra ver hergo çiyî semedê dewlet o. Ti semedê dewlete cuya xo dewam kenî, venî, rakonî û pirayê gênî. Dewlete senîhewa fikrîyena, ti zî gerek sey aye bifikrê. Aye ra teber ti ne eşkenî bifikrî ne eşkenî paye vardê ne zî eşkenî ronişê. Têgêrayîşê to zî no mezg bewlo keno, na hişmendîye reydi ti têgerênê. Gorebê nê fikrî heme çiyî semedê dewlete benê. Yew bingeya na hişmendî ya. Yew zon, yew al yew nasname... Yewêyon ma eşkenê zafê bikerê. Nê derdorî de komel zafê bêqewet kerdo. Xora armancê nê mezgî zî bêqewet kewtişê komelî yo. Înehewa yew komel de heme çiyî hene dewlete ra pawenê mezgî î. Xopawitiş ra xo mird kerdiş varziş ra heyon perwerde heme çiyî hîne dewlete ra paweno her kes. Komel giron o, heme çi yan fesal fesal şono yan zî kewt aver nêşono. Komel teng bîyo, omeyo tengkerdiş. Komel ke ome tengkerdiş, mergê xo hadre keno. Ma nê ewnîyayîşî cuye mîyon de zafê vênenê yan zî ma zafê verba nê halî yenê. Ma xomê nê halî nêyê. Komel û şexs bi xo nêfikrîyenê. Wazenê ke wa dewlete herînda înan bifikrîyo. Nika komel mîyon de bêhêvîya nê sebebon ra est a, naçarê nê sebebon ra est a. Bingeya nê pirsgirekon de mezgê dewlete est o. Înehewa yew komel de mezg teng bîyo. Komel timo xo hewceyê dewlete vêneno. Estbîyayîşê komelî estbîyayîşê dewlet o. Komel pirsgirekon xo çareserî nêkeno, xo peybestê dewlete vêneno. Gorebê aye zî têgêreno. Komel senîhewa verba nê fikronê dewlete eşkeno vecîyo. Heme çîyan ra ver gerek dewlete ra xo biqerifîno. Semedê qerifîyayîşê xo ewnîyo zî gerek yew fikrê neweyî û ewnîyayîşê neweyî awan bikero hem xo de hem zî komel de.

Awankerdişê cuye û komelî îdeolojî û paradîgma reydi beno. Ewnîyayîş hergo komel gorebê xo, komel de aye bîno ra cîya yo. Ma no sebeb ra heme çîyan ra ver gerek komelê xo bişinasnê. Heyon ma komel ma mîyon de nêşinasnê ma nêeşkenê gomonê pîlon bierzê û pirsgirekonê komelî çareser bikerê. Şinasnayîşê komelî şinasnayîşê xo ra vîreno. Ma xo senîhewa şinasnenê. Bonderbeyîş reydi, vendiş reydi, cigêrayîş reydi. Raştîya xo û raştîya komelî fehm kerdiş reydi ma eşkenê encam bigêrê. Beno ke zonayîşê ma keme zî bibo yan zî nîyacon komel nêşko bivêno. Înehewa yew proses de gerek xo newe bikerê nîke ma nêeşkenê proses de aver şîrê yan zî komelî awan bikerê. Eke ma pirsgirekon tomo yew paça ra bigerê dest, ma konê tengasîye. Tengasîye hem fikr hem cuye hem zî pratîk de ma apey bena, komelî apey bena.

Nê prosesî ver xo ti ra pey zî komel awankerdiş o. Xelisîyayîşê komelî û awankerdişê cuya azade encax înehewa mimkîn o. Înehewa ra teber yew rayîr ma nêbeno komelê azadî.







# Tiştanok

Gelî hêjayan, mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd in ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirin. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

***1-Mamê mino***
Diranê wî hene lê tiştekî naxwe
Ew çi ye?

***2- Mamê mino***
Dinivîse lê naxwîne
De bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***

**1-** Şeh **2-** Qelem

# Şerîfa meymûn kedî kir

**Hesen Hemkê**

Şerîfa ku serê wê bi hevjînê wê re her tim di belayê de bû, ji halê xwe re li çareyekê digeriya. Piştî şêwir û mişêwira giran, bi der û cîranê xwe re çû ba melayê gund ku nivîştekê ji hevjînê xwe Şerîfo re çêbike.

Melayê gund piştî li Şerîfayê guhdarî kir, jê re wiha got; 'Tu biçe 2 tayan ji simbêlê Şerîfo ji min re bîne, ez ê bihêlim ku ew bibe wekî gustîlkê di tiliya destê te de.'

Şerîfa vegeriya malê lê kir û nekir keysa xwe nedît ku tayên simbêlê Şerîfo rake.

Şerîfayê berê xwe da parka heywanan û got ez ê 2 tayan ji simbêlê meymûnekî bibim ji mele re û bêjim ev yê Şerîfo ne. Şerîfayê bi xwe re mûz û fêkiyên ku meymûn jê hez dikin birin û berê xwe da parkê.


Çend rojan wiha li ser hev çû û meymûnek ji xwe re kedî kir û baweriya wî baş bi xwe anî. Roja çaremîn dîsa Şerîfayê tevî fêkiyên ku meymûn jê hez dike, berê xwe da parkê ba meymûnê xwe yê kedîkirî.

Şerîfayê bi rehetî 2 ta ji simbêlê meymûn rakirin û birin ba melayê gund. Melayê gund ferq kir ku ew yên meymûnê ne û ji Şerîfayê re got rast bêje te ev mû ji ku anîn.

Şerîfayê hal û meseleya xwe û kedîkirina meymûn ji melayê gund re got.

Mela bi hêrs jê re got; 'Malnemîratê te di nav çar rojan de meymûn kedî kir lê ev bû 20 sal in tu derdê Şerîfo dikişînî û nikarî wî kedî bikî!'





Paşa Şeker

# Xîret bihuşt e!

Li Pasûra Amedê herêmek heye, jê re dibêjen Xiya. Xiya bi hirmiyên xwe navdar e. Kilamek jî heye dibêje, 'Çûme Xiya nav hirmiyan, keçkê dilê min heliya'.

Sofî Evdilrezaq bi eslê xwe xiyî ye. Abdilrezaq ji ber ku guhên wî pir mezin bûn jê re digotin 'Abdilrezaqê guhbel'. Guhên wî ji radara Pirinçlikê zêdetir hesas bûn. Evdilrezaq di dawiya temenê xwe de xwe hînî zimanê erebî kir. Em dikarin bêjin ku alîgirê meleyê mizgeftê bû. Bi hurmeteke mezin her tim guhên xwe dida mele.

Rojeke ji rojan, mele sûreyekê dixwîne (di vê sureyê de Xweda li ser zeytûnê, hêjîrê û li ser çiyayê Sînayê sond xwariye). Piştî ku mele vê sûreya Quranê bi wate dike, porê Evdilrezaq ê gijik, wekî şûr û mertalan li hev dikeve û dibe fişefişa pozê wî û wekî zirneyê deng derdixe.

Ji guhên wî fena tirêna Karazê dûman derdikeve. Lê ji ber hurmeta xwe ya ji bo meleyê gund, dengê xwe nekir, xwe da zorê heta ku cemaet bela bibe. Evdilrezaq bi teşeyekî perîşan xwe avêt derveyî mizgeftê. Ew şev heta serê sibê raneza û dema limêja nîvro hat ber mizgeftê. Cemaeta gund tev li ber mizgeftê bû. Evdilrezaq bi dengekî bilind bang kir, 'Ey ummeta Muhemed, ji vê saatê şûn de, misqalê zerre şeref di pozê me de hebe, êdî em berê xwe nadin qibleya Muhemed.' Gundî tev şaş dibin û jê re dibêjin, 'Evdilrezaq qey tu dîn bûyî, çawa tiştek wiha dibêjî.' Evdilrezaq dibêje, ''Mêze bikin gelî gundiyan, ev hirmiya me ya zer, şêrîn xweşik nekiriye Quranê, ev zeytûna têl, reşik kiriye Quranê, piçek xîret di pozê me de hebe êdî em berê xwe nadin qibleya Muhemed. Ew kesên ku ji xwezayê hez nekin, ji welatê xwe hez nekin, ji gelê xwe hez nekin, xîret di wan de tune ye û bihuşt jî ji wan re tune ye. Ew kesên ku ji bo welat canê xwe dane, zindan raketine ku em ji bona wan kesan xwe neêşînin, xîret di me de tune û bihuşt li me re heram e.'


Îcar mesele meseleya xîretê ye. Tê gotin ku Îmamê Azam Ebû Hanîfe kurd e. Rojekê ji şagirtên xwe dipirse, 'Bihuşt çi ye?' û wekî ezmûnê dide ber wan.

Piştî heftiyekê bersivên şagirtên xwe dixwaze. Hinek dibêjin teqwa ye, hinek dibêjin nimêj, hinek dibêjin bawerî, hinek jî wekî din tiştan dibêjin lê Îmamê Azam dibêje, 'Na bersiva min ev nîne.' Li ser wê rewşê, şagirt dibêjin, 'Xalê seyda bi xwedayê mezin êdî tiştek em bêjin nema, gelo ev bihuşt çi ye?' Îmamê Azam dibêje, 'Bihuşt bixwe xîret e. Ew kesên ku xîreta wan tune be, ji wan re bihuşt jî tune ye...'

***



# XAÇEPIRS




## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

***3-*** Birêveçûn ***5-*** Cînavkek ***7-*** Perî ***8-*** Noteyeke muzîkê ***9-*** Beşeke nivîsîna wêjeyî ***13-*** Gelekî Rojhilata Navîn ***14-*** Bere ***16-*** Bajarekî bakurê Kurdistanê ***19-*** Nîşan ***20-*** Yan jî ***21-*** Kar û xebat ***22-*** Vexwarina sereke ya zarokên biçûk ***25-*** Noteyeke muzîkê ***26-*** Fêkiyekî ku herî zede li Erebistana Siudî çêdibe ***28-*** Serîhildan

## JI JOR BER BI JÊR VE

***1-*** Welatparêzî
***2-*** Paytexta Îtalyayê
***3-*** Noteyeke muzîkê
***4-*** Paytexta Sûriyeyê
***6-*** Kesên ku diçin xwazgînî
***10-*** Televizyoneke herî kevin a kurdan
***11-*** Cihê ku ava lehiyê tê de diherike
***12-*** Nîşaneya  Kêxweşiyê
***15-*** Welatekî ku bi darvekirinê
***17-*** Kesên bê dê û bavbi nav û deng e
***18-*** Perçeyê zirav yê ji qumaş ku ji bo girêdana tiştekî tê bikaranîn
***20-*** Bi sebir
***23-*** Rengek
***24-*** Qul
***27-*** Cînavkek

## Bersiva hefteya borî




# Di ‘Arvîn’ de anatomîya berxwedana cewherî

**Rohat Bûlût, bi Arvînê re vegotinê di navbera rastiyeke objektîf a rojnamegeriyê û realîteya subjektîf a lehenganiyê de hevsengiyekê datîne. Bûyerên rastîn ên sala 2015an bi zimanekî belgeromanî, lê sivik û herikbar, pêşkeş dike**



Hogir Berbir




Belgeromana “Arvîn” a nivîskar û rojnameger Rohat Bûlût ku ji Weşanên Aryenê derçûye, di çarçoveya çîrokbelgeyeke sade de derbas dibe û wekî belgeyeke edebî li ber xwîneran disekine. Ev berhem ne tenê serboriya lehengekê vedibêje, lê ew hewldaneke wêrek e jî, ji bo vegotina berxwedan û têkoşîna di dema serhildanên xwerêveberiyên herêmî yên sala 2015an li bakurê Kurdistanê.

**Rêwîtiyeke epîk û veguherîna leheng**

Struktûra belgeromanê li ser bingeha rêwîtiyeke epîk a lehenga bingehîn, Arvînê, hatiye avakirin. Rêwîtiya wê ya ji Îzmîrê ber bi Nisêbînê û paşê Sûra Amedê, wekî “Rêwîtiya Leheng” di wêjeyê de tê xwendin. Lê belê, di vê rewşê de, rêwîtiya Arvînê ne tenê rêwîtiyeke kesane ye; ew vedigere ser bingeha nasnameyê û çalakiyên bi berxwedaneke civakî têne hûnandin.

Arvîn ku wekî şervaneke azadiyê ji nav dilê gel derketiye, di pêvajoya têkoşînê de fêhm dike ku nasnameya kurdî ji qedera nav û etîketekê zêdetir e; ew dibe “çekek ji têkoşîna gel”. Ev veguherîn, wê ji “nasnameya pasîf” ber bi “nasnameya xwebûnî û şoreşger” ve dibe ku kesayetiya “Arvîn”ê di nav şerê psîkolojîk de têdikoşe û bi ser dikeve.

**Belgeyeke rojnamegeriyê, ne bîranîn**

Yek ji hêmanên herî bihêz ên pirtûka “Arvîn”ê, rola wê ya wekî belgeyeke dîrokî ya wêjeyî di nav berxwedana xwerêveberiyên cewherî de ye. Nivîskar û rojnameger Rohat Bûlût, her çiqas wekî rojnamegerekî şahid be jî, bi rêya vê belgeromanê hewl daye ku dîroka nêzîk ji bîrkirinê wêdetir bi bîr bîne. Bi vî awayî, ev berhem wekî “lîteratûra şahîd” tê pênasekirin ku ne tenê bûyeran vedibêje, lê di heman demê de bandora wan a li ser civakê jî analîz dike.

**Rastiyê radixe ber çavan**

Rohat Bûlût, bi Arvînê re vegotinê di navbera rastiyeke objektîf a rojnamegeriyê û realîteya subjektîf a lehenganiyê de hevsengiyekê datîne. Bûyerên rastîn ên sala 2015an bi zimanekî belgeromanî, lê sivik û herikbar, pêşkeş dike. Bi vê yekê, êş û azarên kûr bi hêza lehengên rastîn re dibin yek û Arvîn dibe mekanîzmayek ji bo parastina bîranînên civakî. Ew vê rastiyê radixe ber çavan ku Arvîn ne navekî xeyalî ye, lê lehengiyeke rasteqîn e ku di wan deman de derketiye holê û bi danîna hîmên bingehîn serkêşî kiriye.

**Şêwaza Bûlût a wêjeyî**

Her çend “Arvîn” berhema yekemîn a nivîskar û rojnameger Rohat Bûlût be jî, şêwaza wê ya vegotinê, bi giştî gihîştî ye. Zimanê wê sade û herikbar e û ev yek rê dide barkêşiya wê ya dîrokî ku mijarên girîng bi awayekî hêsan bigihîne xwîneran. Ev sadebûn, teknîkek di wêjeyê de ye ku armanca wê çîrokê rasterast bigihîne qadeke fireh a wêjehezan.

Di encamê de, “Arvîn” ne tenê belgeromanek li ser şer e; dîtin û bi israr naskirina hêza nasnameyê ye. Rohat Bûlût bi rêya “Arvîn”ê, bi zimanê wêjeyê ji bo nifşên nû dibêje:

“Bihêlin ku bila Arvîn di dilê we de bijî, da ku têkoşîna azadiyê her tim rêya we ronî bike!..”

Bi vê yekê, ev belgeroman ne tenê dîrokê tomar dike, lê di heman demê de felsefeyekê jî bi xwe re radigihîne; hêvî û berxwedan ku çawa bi hev re dimeşin û ji bo pêşerojê dibin milkê gel.

Bo wê dibêjim bê “Arvîn”ê nemînin ku weke min, hûn ê jî jê hez bikin.



# Ka dê çawa be vî halê çanda me?

Cebraîl Vural

Li her herêma me kurdan stranên cihê yên dawetan û dawetên wekî wan stranan hene. Li Botanê strana “Bablekan bablekan, hûn wernê bablekan e !”, him bi naveroka xwe û him jî bi reqsa xwe qala şer dike.

Li herêma Mêrdînê strana “Di cî de, di cî de, di hewşa mala Apê Hecî de,” bi naverok û daweta xwe qala bûyereke gelêrî dike. Axir li gelek herêman mînakên wiha yên cihê cihê hene û hemû jî pêşbirk û qewimînên civakî vedibêjin. Dibe ku wateya wan hin stran û dîlanên me bi demê re hatibe jibîrkirin lê ew stran û dîlan, ji ber ku bûne çand, ji nav gel ranabin. Çimkî, koka çanda me di kûrahiya hişê me de ye. Bi wan stran û dîlanan em stresa xwe kêm dikin, kêfa xwe nû dikin û spora xwe jî pêk tînin.

Tu gel bê stran û dîlan nikare bijî! Lewra stran û dîlan ruhê jiyanê ne. Mesela strana “Hewaya Enqereyê”çi ruhî dide jîyana me? Mixabin di bîst salên dawîn de “Ankara Havasi” ewilî li ser me hat ferzkirin û niha jî bûye stran û lîstika dawetên me, lê ew ê ti carî nikaribe qala ruhê çanda me bike. Çimkî ew di çanda me de tune ye, ya jî wexta ku ew di çanda me de bi cih bibe, ruhê me yê çandî dê wenda bibe here.

Heger em niha bala xwe bidin şêla dawetên xwe, em ê bi rehetî bibînin bê ka ruhê çanda me çi qasî heliyaye! Mesela me xêliya sor avêtiye, em bi pey “gelinlik”ê biha yê mîna pizanê ziya çêlekan ketine. Me dest ji kincên kurmancî berdane, dane pey kincên ku bedena me rezîl û riswa dikin! Dîsa tevî ku di çanda me de tune ye jî, bûk û zavayên me ji qata jor ê hêwana dawetê dest bi şêleke riziyayî dikin û xwe berdidin meydana dawetê; eniya hev maçî dikin, bi hev re didin lotikan, dikevin serê dawetê û destmalkên xwe mîna tezbiyên di destên dînan de kil dikin, di xwêdanê de kal û kumêt dibin. De îcar werin vî kerî di vî bihurî re derbas bikin..!

Gelo ecêb û bobelatên di çanda me kurdan a dawetan de tenê ev in? Na, jê wêdetir jî heye; bûk û zava pastaya bi boyaxkirî li nav meydanê dixin devê hev, berbû pereyan mîna pelê dar û deviyan diweşînin meydana dawetê, lê xizanên me jî li ser sergoyan xwarinê didin hev!!! Ka dê çawa be vî halê çanda me?




Servîsa Çandê

Hefteya borî li çend deverên cuda, hin çalakiyên çand û hunera kurdî pêk hatin. Bi kurtasî çalakiyên derketin pêş ev in:

***Pêşangeha jinan***

Li bajarê Kerkûkê, bi beşdariya hejmareke jinên hunermend û welatiyan, ji bo neh hunermedên jin bi navê ‘Jinên Behremend ên Kerkûkê’ pêşangehek hat vekirin. Ev hunermendên jin ku tevlî pêşangehê bûn, ji neteweyên kurd, ereb û tirkmen in.

***Festîvala Dengê Arkaîk***

Bi pêşengiya Jineolojiyê ya Îtalyayê û rêxistinên jinan ên li Îtalyayê yên weke Rete Jin û jinên Rete Kurdistan, Ni Una Di Meno, ADM Jin û Jinên Ciwan, Festivala Dengê Arkaîk a duyemîn hat lidarxistin. Festîval ji bo bîranîna Nagîhan Akarsel ku 4ê cotmeha 2022an li Silêmaniyê hatibû kuştin, hat birêxistinkirin.

***Şevbêrka Kanîreşê***

Kanîreşiyên li bajarên cuda yên Almanyayê, ji bo xwedîderketina li nasname, çand û ruhê piştevaniya civakî ‘Şevbêrka Kanîreşê’ li dar xist. Şevbêrk ji aliyê Karliova Deutschland Kultur Bildungsverein (Komeleya Çand û Perwerdeyê ya Elmanyayê ya Kanîreşê) ve li bajarê Wuppertalê hat lidarxistin û gelek kes tevlî şevbêrkê bûn. Çalakî veguherî platforma piştevaniya çandî. Hozan Şemdîn, Hozan Zozan, Huner Ayzon, Memozan û Ûlaş Kelaşîn derketin ser dikê û hunera xwe pêşkêş kir.

***Kovara Hunerê***

Kovara Hunerê hejmara xwe ya heftemîn weşand. Di vê hejmarê de du mijarên bingehîn ên bi sernavên “Danasîna Şehîdên Hunerê” û “Komunên Hunerê” diçe ber destên xwînerên xwe.




# Pirtûka ‘Mohra Reş’ wergerê almanî kirin

Servîsa Çandê

Pirtûka Yildiz Çakar a bi navê Mohra Reş, li zimanî Almanî hate wergerandin. Pirtûka Yildiz Çakar, bi du zimanan (Kurmancî û Almanî) hate çap kirin û wê cara pêşîn di Pêşangeha Navneteweyî ya Pirtûkan a Frankfurtê de were nasandin.

Mohra Reş ya ku bi wergera Almanî Dunkles Siegel ji 9 helbestan pêk tê. Ev 9 helbestçîrok pirtûka yekem a Yildiz Çakar e ku bi Almanî hatiye wergerandin. Mohra Reş ji hêla Berîvana Î. û Mario Pschera ve hatiye wergerandin. Ji nûh ve lêkirin û êdîtoriya pirtûkê jî ji hêla şairê alman Tobias Roth ve hatiye kirin.



xwebûn

17 - 23 Mijdar 2025 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 309

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw
Adar Gulan
Heval Dilbihar
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/5 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

Ji bo abonetiyê
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Tehm û rengê Kurdistanê: Berû



Rohat Bulut



Yek ji fêkiyên xwezaya Kurdistanê û ya herî sûdewer berû ye ku em ji feydeyên wê zêde ne haydar in. Lê em vê dizanin ku tehm û rengê Kurdistanê dara berûyê ye. Di vê nivîsê de em li ser berûyê raswestin

Van rojên borî danê êvarekê li gel hevalan, berê me ket aliyê navçeya Gêlê ya Amedê. Em li binê dara berûyekê rûniştin û me bêhna xwe veda. Demsala payîzê jî xweza bi mirov xweştir tê û hestên cuda dide avakirin. Xweza mirov dikişîne nav kûrahiya xwe û dide fikirîn. Ew xweza ye ku bi her awayî jiyanê ava dike û hemû zindîwaran bi tehm û xurekên xwe, nebat û fêkiyên xwe têr dike. Yek ji van xurekan jî fêkiyên ku herî zêde li xwezaya Kurdistanê bala mirovan dikişînin, berû ye. Dara ku em li binê wê rûniştin jî me dikişand nav kûrahiya wateyan û dida fikirîn. Min jî vê xwest bi nivîsekê ev dara berûyê û feydeyên wê ji bo we hêjayan binivîsim û li aliyê wê yê zanistî jî bikolim û parve bikim.

Belê yek ji xurekên payîzî û yên ku herî zêde li Kurdistanê peyda dibin berû ye. Dara berûyê li seranserî Kurdistanê li herêmên ku dar û daristan hebin şîn dibe. Dara berûyê dareke bi reh û kok e. Di heman demê de yek ji remzên Kurdistanê ye. Dareke ku gelekî bi derengî digihîje, lê temenê wê gelekî dirêj e. Heke bi destên mirovan neyê birîn an jî ji kokê ve neyê rakirin bi xwezayî hişkbûna wê nayê dîtin.

**Çandina darên berûyan**

Di xwezayê de ev darên berûyan jixweber zêde dibin. Lê belê heke mirov bixwaze wekî şitil biçîne hin pêvajoyên wê hene. Berûyên ku ji darên xwe dikevin an jî tên berhevkirin wekî gelek tovên darên fêkiyan li cihekî bi ewle tê binaxkirin û her tim cihê wan tê avdan û rewaya wan tê parastin ku aj bidin.

Piştî sê mehan, tov şîn dibin. Yanî bi taybetî ev pêvajo di mehên zivistanê de bi pêş dikeve û bi biharê re êdî berû aj didin, dibin şitil. Lê demekê li cihê ku ji bo şitil tên çandan tên parastin. Piştî ku rehên xwe berdidin û hinekî xwe digirin êdî li cihê pêwîst ji bo çandiniyê amade dibin. Ji ber ku dereng mezin dibin pêwîst e ku heta xwe bigirin her tim bên parastin.

Bihevrebûna an jî komên darên berû yên biçûk re devî tê gotin. Lê dema hin ji wan deviyan tê rebizandin kat û guliyên wan tên birîn û ji bo bibe dara berûyê teşe tê dayîn. Ev pêvajoyeke dirêj e. Heke ew devî neyê rebizandin bi serê xwe nabe dar û berûyên pak jî nagire.

Belê piştî ku ew devî dibe berû û fêkiyan digire sal bi sal gir dibe û bedew dibe. Hem bi hebûna xwe û hem jî bi rengê xwe xweza û çiyayên Kurdistanê, ji welat û erdnîgariyên din cuda dide xuyakirin. Mirov dikare bêje rengê Kurdistanê ji rengê dar û daristanên berûyan pêk tê.

Gelek cureyên berûyan hene; hin ji wan piçûk, hin ji wan jî mezin in, hin ji wan tehl û hin ji wan jî şîrîn in, hin ji wan tên xwarin û hin ji wan jî nayên xwarin. Werhasil gelek cureyên wan hene lê em ê li ser dar û cureyên berûyên ku tên xwarin rawestin.

**Hilberînên ji berûyan**

Heke em hinekî bi taybetmendî û bikaranîna berûyan dakevin, em ê bibînin ku çiqasî ji bo mirovan bikêrhatî û fonksiyonel in. Li Kurdistanê nebe jî li gelek deveran ji bo gelek tiştan tê bikaranîn û hilberîneke bêhempa jê tê girtin. Yek ji van hilberînan jî rûn e. Rûnê berûyê malzemeyek xwarinê yê nû ye ku nirxa xurekî ya bilind heye, asîdên rûn ên bingehîn dewlemend in û pêkhateyên biyoaktîf ên wekî tokoferol e. Ev rûn antîoksîdan e û di pêşîlêgirtina nexweşiyên wekî nexweşiya dil û damaran, penceşêr û şekir de feydeyên xwe hene ku ji aliyê zanistê û bijîşkan ve hatiye piştraskirin.

Berû, berhemeke xwezayî ye ku herî zêde li Kurdistanê peyda dibe. Ji bo mirovan gelekî sûdwar e ku pispor û zanist feydeyên wê dinirxînin. Ji bo ku hûn feydeyên ku xweza pêşkêşî me mirovan dike binirxînin, pêşî divê em fêm bikin ka berû çi ye. Bi rastî jî feydeyên berûyan mirov matmayî dihêl e.

**Berû çi ye?**

Bi gotineke hêsan, berû fêkiya dara berûyê ye. Dara berûyê dikare heta 30 metreyan jî bilind bibe. Fêkiyên ku ji van daran têne hilberandin jî wekî berû tên zanîn. Di mehên îlon û cotmehê de, berû berî ku fêkî bi tevahî bigihîjin tên berhevkirin. Fêkiyên hatine berhevkirin li ber tavê tên zuhakirin. Ji aliyê mirovan ve gelek tê hezkirin. Bi taybetî jî mirovên ku li gundên çiyê dijîn. Ne tenê mirov ji bo sewalan jî xurekeke herî zêde bi tehm e. Bi taybetî jî sewalkar di mehên dawiya havînê û destpêka payizê de van berûyan berhev dikin û ji bo zivistanê bidin sewalên xwe mihafeze dikin.

**Xwerina berûyan**

Di warê xwarinê de jî em hin agahiyan par ve bikin. Her çiqas xwarina berûyan bi xavî zêde neyê tercîhkirin jî tê xwarin. Dema ku hêj nû ji daran tê jêkirin bi kêrê qalikên wan tê rakirin û qalikê binî jî tê qaşkirin. Piştre jî tê xwarin. Lê bi gelemperî li Kurdistanê li ser sobeya êzingan tê biraştin, piştre qalikên wan tên rakirin û bi germî tê xwarin. Berûyên biraştî tehma wan xweştir e ji yên xav. Lewra berûyên xav tehlokî ne. Li hin deveran jî piştî qaşkirinê berûyan dixin nav avê û dikelînin. Bi vê rêbazê jî tehliya berûyan ji wan diçe û ji xwarinê re amade dibin.

Hin kes berûyan diqeşêrin li ber tavê zuha dikin û piştre jî wan dihêrin û wekî arvan radikin. Di şîraniyên wekî nan, kek û kulîçeyan de tevlî ardê genim tê kirin. Wekî alternatîfek qehweya bê kafeîn e. Ji bo tîrkirina şorbeyê û wekî sosê tê bikaranîn.

**Feydeyên berûyan**

Berû ji bo rûviyan baş e, zikêşiyê (îshal) derbas dike. Di nav civakê de tê dîtin ku berû ji bo dermankirina rewşa zikêşiyê hatine bikaranîn. Pispor dibêjin berû ji bo hevsengiya rûviyan baş e. Di encama hin lêkolînên zanistî de em rastî gelek feydeyên berûyan tên. Em dibînin ku gelên xwecih li çaraliyên cîhanê wan wekî antîseptîk û ji bo dermankirina nexweşiyên gastrointestinal ên wekî îshal û hemorroîdê bi kar tînin. Qalikê berûyan pir girîng e û di bijîşkiyê de wekî antîseptîk û hemostatîk tê bikaranîn. Ji bo dermankirina êşa diranan û gastropatiyan û her wiha wekî aramker ji bo îltihaban û başkirina şewatê tê bikaranîn. Li mixabin li Kurdistanê ev fêkiya ewqas bikêrhatî tenê wekî fêkiyekê tê xwarin.

Li Cezayîr, Fas û rojhilatê Dewletên Yekbûyî, rûnê ku ji berûyan tê derxistin di çêkirina xwarinê de û wekî melhemek ji bo şewat û birînan têbikaranîn.

**Ji bo birînan tê bikaranîn**

Di nav feydeyên berûyê de şiyana wan a başkirina birînan û zuhakirina îltihabê jî heye. Potansiyela ekstraktên berûyê di şerê li dijî îltihabê de ji hêla lêkolînên laboratîf û heywanan ve hatiye piştgirîkirin. Hatiye dîtin ku ekstraktên ji hin cureyên berûyê, wek quercus acutissima, nîşankerên ku dibin sedema îltihabê di şaneyên çerm de kêm dikin.

**Bi vîtamînan dewlemend in**

Berû di warê vîtamîna Byê de jî dewlemend e. Berû, di nav xwe de karbonhîdrat, proteîn, mîneral (kalsiyûm, potasyûm, magnezyûm) û vîtamînên B dihewîne. Ew di heman demê de astên bilind ên pêkhateyên fenolîk û antîoksîdan jî dihewîne. Li Kurdistanê nebe jî li gelek welatên cîhanê di nav şîrînahiyên wan de şîrînahiya (rîçal) berû jî cihê xwe digirin.

**Hevsengkirina kolestrolê**

Her wiha li gorî daneyên zanistî yên bijîşkan, ji bo kolesterolê jî baş e. Berû, rûnên netêrbûyî dihewîne. Ji ber ku ew bi van rûnan dewlemend in, ew asta kolesterolê ya xirab kêm dikin. Ew dikarin kolesterolê hevseng bikin.

**Stresa oksîdatîf diparêze**

Di nav feydeyên berûyan de, şiyana wan a xurtkirina pergala parastinê ya laş heye. Li gorî agahiyên zanistî; berû kalsiyûm, potasyûm û gelek vîtamînên din dihewîne; naveroka wan a bilind a antîoksîdan stresa oksîdatîf jî kêm dike û li dijî zirarê şaneyan diparêze. Van pêkhateyan wekî antîoksîdanên bihêz ên çareserker ên bandorker hatine nîşandan ku masûlke û tevnên din ji stresa oksîdatîf diparêzin.



## Hin ji kurtefeydeyên berûyê

Bi berfirehî em li ser berûyê û feydeyên wên radiwestin. Lê li vê derê bi em dixwazin bi kurteyî behsa feydeyên berûyê bikin:

- ✓ Ji pergala xebitîna rûviyan re dibe alîkar.
- ✓ Ji bo hin birînan tê bikaranîn. Bi taybetî jî ji bo birînên xwerû yên li ser çerm tên bikaranîn.
- ✓ Ji bo îltihabê (enfeksîon) kêm bike tê bikaranîn.
- ✓ Di warê vîtamînê de têr û tije ye.
- ✓ Kolesterolê hevseng dike.
- ✓ Antîoksîdan tê de hene.
- ✓ Yên ku nexweşiya şekir bi wan re hebe, bi taybetî berûyan dixwin. Lewra li gorî hekîm û bijîjkan berû ji bo nexwşîna şekir bikêrhatî ye.

## Beldariyek ji bo nexweşiyan

Lê bele bijîşk ji bo xwarina berûyan jî hişyariyekê dikin. Divê kesên ji gurçik an jî kezeba xwe nexweş, jinên ducanî yan şîrdanê berûyan nexwin, yan jî ji bijîşkê xwe bipirsin. Li aliyê din her çend çaya berûyan an jî ava berûyan ji bo nexweşiya şekir sûdmend tê hesibandin jî, girîng e ku di hin rewşan de bi pisporan re şêwir bê kirin. Nexweşên şekir divê berî xwarina berûyan bi bijîşkên xwe re bişêwirin.

